


Nûbihar

MEHNAMEYA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



Piştî sê salan
Nûbihar

HEJMAR 36 • İLON 1995 • 50.000 TL

ALFABEYÊN LATÎNÎ Û EREBÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	TIRKÎ	EREBÎ	MÎNAK
A a	Azadî	Özgürlük	ا، ئ، ا	ئازادى
B b	Bangdan	Ezan	ب، بـ، بـ	بانگدان
C c	Ceng	Savaş	ج، جـ، جـ	جنگ
Ç ç	Çem	Irmak	چ، چـ، چـ	چم
D d	Dîrok	Tarih	د، دـ، دـ	دیروزك
E e	Evîn	Aşk	هـ، هـ، هـ	ئەفین
Ê ê	Êvar	Akşam	ئـ، ئـ، ئـ	ئيقار
F f	Ferîste	Melek	فـ، فـ، فـ	فریشته
G g	Genim	Buğday	گـ، گـ، گـ	گەنم
H h	Hawar	İmdat	هـ، هـ، هـ	هاوار
I i	Istirî	Diken	ئـ، ئـ، ئـ	ئىسترى
Î î	Îstikan	Çay bardağı	ئـ، ئـ، ئـ	ئىستakan
J j	Jin	Kadın	ژـ، ژـ، ژـ	ژن
K k	Kulîlk	Çiçek	کـ، کـ، کـ	کوليلك
L l	Lorîn	Ninni	لـ، لـ، لـ	لورىن
M m	Meh	Ay	مـ، مـ، مـ	مەھ
N n	Nan	Ekmek	نـ، نـ، نـ	نان
O o	Ol	Din	ئـ، ئـ، ئـ	ئۆزۈل
P p	Paşîv	Sahur	پـ، پـ، پـ	پاشيف
Q q	Qenc	İyi	قـ، قـ، قـ	قەنج
R r	Rojava	Batı	رـ، رـ، رـ	رۇزىقا
S s	Sipî	Beyaz	سـ، سـ، سـ	سېپى
Ş ş	Şev	Gece	شـ، شـ، شـ	شەف
T t	Tav	Güneş	تـ، تـ، تـ	تاف
U u	Umêd	Umut	ئـ، سـ، سـ	ئۆمىد
Û û	Ûşî	Salkım	ئـ، سـ، سـ	ئوشى
V v	Vejîn	Diriliş	فـ، فـ، فـ	فەزىن
W w	Welat	Vatan	وـ، سـ، سـ	وهلات
X x	Xweda	Tanrı	خـ، خـ، خـ	خوددا
Y y	Yar	Sevgili	يـ، يـ، يـ	يار
Z z	Zava	Damat	زـ، زـ، زـ	زاڤا

Nûbihar

MEHNAMEYA CANDI HUNEREE EDEBİ
(AYLIK KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERGİSİ)

Kızlaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3

Fatih-İstanbul

Tel: (212) 533 75 88

Faks: (212) 524 00 38

Xwedî û Berpirsiyarê Nivisaran
(Sahibi ve Yazılışları Müdürü)

Süleyman Çevik

Berpirsiyarê Giştî
(Genel Yayın Yönetmeni)

Sabah Kara

Mudîrê Tiprîzî û Arşîvê
(Dizgi ve Arşiv Müdürü)

Ali Karadeniz

Muşawirê Nivisaran
(Yayın Danışmanı)

Mustafa Goyanı

Nûnerê Alamanya
(Almanya Temsilcisi)

Naci Gülmез

Tel: 221 732 63 33 Köln

Nûbiharkovareke mehane ya çandı, huneri û edebî ye. Bîrûbaweriyen xwedyên berheman, lizûmen ne bîrûbaweriyen Nûbihar in. Nivisaran ku bi imzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê Nûbihar têr weşandin, bîrûbawerîya me nişan didin. Nûbihar di serrastkirina berhemen şandî de azad 9.

Bedela Abonetiya Salane
(Yıllık Abone Bedeli)

Lî hundır (Yurt içi): 600.000 TL

Lî dîrve (Yurt dışı): 60 DM

Jimareyên Hesaban
(Hesap Numaraları)

Lî hundır (Yurt içi): Postgiro (Posta
Çeki), Süleyman Çevik, 658265

Lî dîrve (Yurt dışı): Süleyman Çevik,
İş Bankası Yavuz Selim Şubesi, 1079-
30100-3118770

Tiprîzî û Pergala Rûpelan
(Dizgi ve Mizanpaj)

Nûbihar

Berg (Kapak)

Nûbihar

Çapxane (Matbaa)

Nesli Matbaacılık

NAVEROK

SABAH KARA

PIŞTÎ SÊ SALAN NÛBIHAR..... 3

MEMË ALAN LÊPIRSİN 4

AHMET ARAS LÊPIRSİN 5

M. RAUF ÇİÇEK LÊPIRSİN 5

YILMAZ ÇAMLIBEL LÊPIRSİN 7

SÜLEYMAN AKTÜRK LÊPIRSİN 7

YAKUP KARADEMİR LÊPIRSİN 8

ZEYNELABİDÎN ZINAR LÊPIRSİN 9

FIRAT CEWERİ LÊPIRSİN 9

LATİF ÖZDEMİR LÊPIRSİN 10

BEDIRXAN EPÖZDEMİR LÊPIRSİN 10

FEQÎ HUSEYN LÊPIRSİN 11

LOKMAN POLAT LÊPIRSİN 12

MIHEMED DEHSIWAR LÊPIRSİN 13

NACÎ KUTLAY LÊPIRSİN 13

ZANA FARQÎNÎ LÊPIRSİN 14

SUUT KILIÇ LÊPIRSİN 14

AHMET ÖNAL LÊPIRSİN 15

FELAT DILGES LÊPIRSİN 15

NACÎ GÜLMEZ LÊPIRSİN 16

M. LATİF SALİHOĞLU LÊPIRSİN 17

ABDULLAH XERÎB LÊPIRSİN 17

CANKURD
BO SÊSALIYA NÛBIHAR..... 18

MELA QASIM
NUQRUC / 54 - 58 19

BABA TAHİRË URYAN

SABAH KARA
DUBEYTÎ / 146 - 155 20

MEWLANA CELALEDİNÊ ROMÎ

SABAH KARA
MESNEWÎ / 14 21

NURETTİN DURMAN

HOZAN OFLAZ
ŞÊX Û MIRİN 22

XELİL AMED
ZAROKNAME / 2 23

SEYİD ELİYË FINDIKÎ

BABË HACER BÊRIVÂN
DİWAN / 4 26

SELMAN CİHADVAN

PIRSNAME / 5 27

NAVEROKA SALA SÊYEMÎN 28



Piştî sê salan Nûbihar

SABAH KARA

Berî her tiştî, me xwest em li zimanê bav û bapîrê xwe bibin xwedî. Me xwest bi vî zimanê şîrîn em strana kul û kederê xwe bibêjin û rê li ber şahiyên pêşerojê vekin. Me xwest wek "Bilûrvanê Gundê Mişkan", em bi newaya bilûra kurdî, xwe û hemû zarûkên kurdan ji "gundê mişkan" xelas bikin.

Berî niha bi sê salan... Car-din weku van rojan payîz bû û me bi sernivîsara "Ne zalim be, ne mezlûm" û bi pêş-peyva "Di payîz de nûbihar" dest bi weşandina Nûbiharê kiribû. Ev e sê sal ji ser vê bû-yera giring buhûrin. Sê salên dirêj...

Gelo me çi dixwest û em gihiştin kûderê?

Berî her tiştî, me xwest em li zimanê bav û bapîrê xwe bibin xwedî. Me xwest bi vî zimanê şîrîn em strana kul û kederê xwe bibêjin û rê li ber şahiyên pêşerojê vekin. Me xwest wek "Bilûrvanê Gundê Mişkan", em bi newaya bilûra kurdî, xwe û hemû zarûkên kurdan ji "gundê mişkan" xelas bikin.

Me xwest em her cur dogmatîzm, çavkorîtî, dil-korîtî û mêtîjîkorîtiyê red bikin; li hember payîzê, em alaya "bihare" û li hember dogmatîzmê, em alaya "azadiya ramanê" bilind bikin.

Me go, "Bila nav, me nêxapînin!" Me go, "Geli semîmî û jidilan; werin! Ev dergehê me, dergehê nawmîdiyê nîne; werin! Bîrûbaweriya we çi dibe, werin! Hun ji çend dergehan zivirîbin, werin! Em heval û hogirê we ne; werin!.. Werin da ku em piştî sedsalan, bihara xwe pêk bînin!"

Me dît ku Xaniyê gewre, ji pişt perdeya sedsalan, me zarûkên kurdên mezlûm bi biharê, bi nûbiharê vedixwîne! Me go, "Lebbeyk!" û me da rê. Me dest ji ehmeqan berda; me dest ji zaliman berda û me da rê. Me go, "Em mezlûm in û mezlûm birayê me ne!" Me go, "Em ne zalim in û zalim dijminê me ne!" Me go, "Emê her dijminê zaliman bin û her hevalê mezlûman bin!" û me da rê...

Berî niha bi sê salan... Di hejmara yekemîn a Nûbiharê de me gotibû:

"Mîrovê ku heq hixe bin

lingê xwe, pê bilind nabe. Heq li ser piyan bilind dibe û bilindvanê xwe jî bi xwe re bilind dike. Di heq û heqîqetê de, bilindvan û bilindbûyi pevre ne. Wexta bilindvan heq bilind kir, heq jî bilindvan bilind dike.

Naxwe emê heq û heqîqetê bilind bikin û emê ji heq û heqîqetê re terefdayîyê bikin. Ko heqî di eleyhê me de jî be, emê terefdarê heqiyê bin. (...)

Erê, ko birayê me jî be, em dijminê zalim in û zalim dijminê me ye.

Hema emê terefdayîya kî bikin?

Emê terefdayîya mezlûm bikin û hew!

Ger misilman û ger ne misilman; kî mezlûm be, emê arîkariya wî bikin. (...)

Em dixwazin ku em dostê ketiyan bin, kesê bêkesan û hevalê bêhevalan bin. (...) Em dixwazin ku em dijminê mustekbiran û zaliman û zordaran bin. (...)

Ma ne eyb û fihêt e ku em dijmiyîya ketî û mezlûm û belengaz û musted'efan bikin?!

Ma ne şerm û fihêt e ku em destê heqdaran berdin û destê neheqan bigrin?

Wext ew wext e ku em guh bidin hevûdu.

Wext ew wext e ku em



1. Ne zalim be, ne mezlûm

dest bidin hevûdu.

Wext ew wext e ku em belengaz û mezlûmên heqdar bibin yek û di miqabilê zilm û zorê de bisekinin.

Wext ew wext e ku em bizanibin û bi zanayî qebûl bikin, yan red!" (Di payîz de nûbihar, hî 1, rp 3, Çiriya Pêşin 1992)

Di dawiya peyvan de dixwazim bibejim ku, em hê li ser soza xwe ne û emê her li ser soza xwe bin.

Hunê li jêr, li ser sê salê Nûbiharê raman û rexneyên rewşenbîrên me bixwînîn.

Em ji heval û hogirêñ kubersiv dane vê lêpirsînê re si-pas dikan.

Bi xatirê we.

Memê Alan:

Gotinek mezinêñ tirkan Gheye; dibêjin ku: "Xatirê fincanek qehwê, çel sal didome." Her çiqas hevalêñ Tirk bi vê gotina mazinêñ xwe nelivin jî, lê ev gotin, bi wateya xwe rastiyek mezin tînê zimêñ. Min got, Tirk bi gor vê gotinê nalivin; belê ev idîaya min jî rast e. Hûnê bêjin çawa? Hevalêñ ku ji dîrokê xeberdar bin, dizanîn ku, dema gelê Tirk, ji ber xela, birçibûn û şerê Asyaya Navîn koçber bûn û wekî qereçîyan bi çol û çiyan ketin, rêka wan bi Kurdistanê ket. Me, ji ber safitî û sofîtiya xwe hemû rîk û dirb li ber wan ve-kir; me, ew kirin taca serê xwe; herwekî ensarêñ Pêxember, me meamela mihacirîyê li Tirkan kir û me, mal û pertalêñ xwe di navêna xwe û wan de parve kir. Li pêş van kiryarêñ me yêñ bi xêrûbêr, pir heyf û xebînt ku, birayêñ Tirk dest bi nankorî û xê-nîmetê kirin. Wek reqelêñ serê laş û terman, hilkêşî-

yan serê me û bi qîl û pencêñ xwe ketin canê me, dest dan ser war û welatê me, çahv xis-tin namûsa me, dest bi mêtin û mijîna hemî hebûn û dew-le-mendiya me kirin... Hêviya me ji Yezdan ku, ev kiryarêñ wan ji wan re nemîne însael-lah!

Belê, me ev rastiya tarîxî, bi sayet û dersdayina Nûbiharê fêm kir û fêrisand. Ev fam û fêrisandin jî bû wesîle û navgîna têgihaştîya xwenaskirinê. Ev xwenaskirin, wê roj bi roj bi kûr û firehî pêşve here. Pêşvebirina xwenaskirinê, helbet bi xwendin û ve-kolandinê derfêt dibe. Ji bo xwendin û vekolandinê, çav-kaniya herî saxlem û herî di-rust —ez bi şexsê xwe— kovara Nûbihar dibînim.

Heftê sal e ku fermandari-ya Kemalîzmê, bi hemû dij-warî û hovîtiya xwe, li ser gelê Kurdistanê bi darê zorê û bi vekuştina mîjîyê Kurdan, te-menê xwe yê bêxêr didomîne. Bi rehperestiyek wehşî û dij-mirovî, netewê Kurd yek bi yek, carna jî bi tevayî dikuje û dipişefîne. Vaye di nêv vê

wehşetê de derkftina Nûbiharê, bi serê xwe berxweda-nek pîroz, serihildanek birêz û rûmetdar, hêviyek bilind û şoreşek mezin e.

Mirovî bi salan di zîndanê de mabe, çawa ku hes-retkêşê tîrêj û tavê ye; mirovî tîh û birçî be, çawa ku hewcedarê av û xwarinê ye; mirovî bê mal û bê war be, çawa ku li bende û hêviya si-tarek û niştîmanekî ye... her-wusa, belkî bi zêdeyî gelê Kurd jî hewcedarê kovara Nûbiharê ye. Digel mirov bi xwe, pir nankor û bîrnebir e. Bi ge-lekan ez dizanim ku bi çahvtîelandin û meraqek me-zin, li hêviya kovarak İslâmî û maferî bûn. Digotin: "Heger kovarek kurdî ya bi gor bîr û baweriya İslâmî derwere, welew di bêrika me de yek metelik jî nemîne, emê dîsa jî ji-yana kovarê biparêzin..." Lê pir mixabin ku dema Nûbihar derket meydanê, wan he-valêñ şormezin, ew sozêñ xwe yêñ berê ji bîrve kirin. Halvaku, divêt şol û şorêñ mirov, hev û din danrast bike.

Diyare ku, çi kovar dibe, çi rojname dibe; ji bo berdewamkirin û vejîn-dayina wan, divêt pişte-vanî û destegîriya xwen-devanan lê hebit. Na, heger ev arîkarya xwendevanan lê çênebe, an tine-be; helbet wê ev xebat ji qada têkoşeryê rabe, wê ev karpêkan, herwekî za-rokêñ berhavêjî, bimire; û ewê dostan xemgîn, dijminan jî kêfxwêş û dil-şad bike. Ji ber vêqasê, ez ji hevalêñ hemiyetperwer rica dikim ku, bila di peyv û tevgerên xwe de durist bin. Tiştêñ ku bi devkî dibêjin, bila bi livjen û pratikêñ xwe jî bidin îsbat û peyitandin. Yan jî, ev rewş û ev reng, ne şan û babetêñ kesêñ dozdar û mafxwaza ne. Şopme-



2. Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye

şandin û biserxitina doza wî gelê situxwar, encax û encax bi fidekarî û cangorî pêk têt.

Pêwîst e ku em hemî, ji bo vê doza maf û hiqûqên xwe yên meşrû, têkoşînek mezin pêk bînin. Bi xebat û bi labat, divêt em têkevin bin ling û bin baskên gelê xwe, em wan hilbidin jor, em wan hayîdarê cîhanê bikin, em wan çahv-nasen buyerên nav xwe û ha-wîrdorêñ xwe bikin; da ku bi lez û bez ew jî bighêjin armanc û mebesten xwe yên insanî. Bi xwezayî, ev rewş jî bi xwendin û bi hişyarbûnê bi cîh dibe.

Iroj, bi zarê me yê Zazakî û bi Kurmanciyek xwerû, kovara me Nûbihar, vê wezîfa xwendedarî û hişyarkirinê bi-heqqin bi cîh tîne. Bi kur-tebêjî, ji bo temendirêjbûna Nûbiharê, xwedîderkeftina me pêwîstiyek girîng e. Em, bi tev ji bîr nekin ku, berde-wamya Nûbiharê ji bo gelê me rûgeşî û rûsipîtiyek dîrokî ye.

Salvegera sêsalîya kovara Nûbiharê ji we hemiyan re-pîroz be. Amîn.

•••

□ Ahmet Aras:

Serî de ez sêsalîya Nûbiharê pîroz dikim.

Ez dixwazim bi çavê xwendevaneñkî fikra xwe bêjim.

Min cara ewil hejmareke kovarê di bûroya hevalekî de dît. Min wê çaxê zêde guh nedayê. Min di dilê xwe de go: "Ev jî fun-deke dînciyan a nû ye." Lî navê Nûbiharê bala min kişandibû.

Paşê li cem wî hevalî min çend hejmarêñ din jî dîtin. Min ku dîsa ew hil-dane destê xwe, hinekî lê nihêrî, heval got: "Kek, evêñ ku vê kovarê derdi-xin ne wekî wanêñ "din" in." Ango wanêñ ku jê re

dibêñ "dîncî". Bi rastî jî bawerya min bi ti awayî bi wan dînciyan tunebû. Ciyê ku bîh-na wan jê bê, ez bi rêya heft qonaxa jê direvîm. Ew, tenê bawerya merivêñ bawermend iştîsmar dikin, pê şu-xulê xwe li rê dibin. Lî merivêñ dîndar pir dûrî wan û karêñ wan in. Ew, bi dilsozî li ser rêya bawerya xwe dimeşin.

Ez dirêj nekim, min me-raq kir û ew hejmaran xwendin. Bi rastî ez dawyê de hatim ser fikra wî hevalî. Min dît ku nivîskarêñ Nûbiharê merivêñ bawermendêñ dil-soz in. Berî her tiştî li şexsi-yeta gelê xwe û çanda gelê xwe xweyî derdikevin, di Kur-dîtiya xwe de bi dil û can in.

Nivîskar û rewşenbîrên (!) Kurda bi gelempêri oportû-nîst in, li gor hewa rojê, xwe dihejînin, zikê xwe zer dikin û her tiştî tevlihev dikin. Lî ni-vîskarêñ Nûbiharê wusa nîn in, li ser pirsgirêkan bi giranî, bi hemdê xwe û bi dil û can disekeñin, dinivîsînin, pale-pistûkyan nakin û fikra xwe

rasterast dibêjin. Ev jî tiştekî pir muhîm e.

Di hejmarêñ ewilîn de zi-manê kovarê hinekî qels bû. Lî wusa dixuyê ku emeg-darêñ kovarê hewl dane xwe, zimanê kovarê têkûz kirine û gellek pêş de çûne. Naveroka kovarê jî gellek tijî û rengîn bûye. Bi bawerya min, Nûbihar ku bi vê sitîlê dom bike, wê ji çanda Kurdî re xizmeten pir muhîm bike û wê bibe kovareke numûne.

Ez pîrsa xwe bi henekekî (laqirdîkî) temam kim.

Dixuyê ku meyla nivîskar û berpirsiyaren Nûbiharê hi-nekî zêde li ser dunya din e. Di nav herdu dunya de bal-ansekî çêkin, wê baştir be.

•••

□ M. Rauf Çiçek:

Adet e. Wexta ku kovarek Aderterê, karbîdesten wê, pîr-sekî dîkin. Pîrs meşhûr e:

"Ev kovar cîma dertê."

Lêbelê di heqîqetê de ber-siva vê pîrsê bi derhatina kovarê hatiye dan. Lewra der-hatina kovarê bi xwe, bersi-va vê pîrsê ye. Kovar bi xwe dibêje ku cîma dertê."

Sê sal berê Nûbihar di payîzek wiha de bi ser-navê "Di payîz de nûbi-har" bi gotinêñ jor dest bi weşanê kir. Bi naverokek germ û zimanek şîrîn.

Rêya xwe jî di bergê de parole kiribû: "Ne zalim be, ne mezlûm." Li cem mezlûman û li dijî zalim û zordestan.

Wek ku di destpêkê de jî hatibû nivîsandin, bi derketina xwe, sedemê derketinê nîşan dabû.

Bi derketina xwe jî her alî re hinare (mesaj) şan-dibû.

Xwerû digot: "Ez dengê kurda me, misliman im. Çi heq be, ezê wî bêjim û bigrim. Ku heqî di ber aleyhê me de jî be, emê

8. Dar li ser kokê xwe hêşîn dîbin, mîrov li ser zimanê xwe

terfdarê heqiyê bin. Lewra ti-liya şerîet birrî, naêse."

Kî dibe bila bibe ku vê yekê nepejirîne bila derkeve qadê. Aha di sê salan de bi sî û şes hejmarên xwe Nûbihar!

Bi derketina xwe dilê pir kesan dilşa kiribû. Wek ku di Nûbihar de hatibû weşandinê, hineka nizanîbû bi çi gotinan pîroz bikirina:

"EZ nizanim bi çi kelîmê we pîroz bikim ji bo vê xelata hêja û giranbiha, ji bo vê bi-hara ku we diyarî kurdê hejar kiriye. Xweda kulîkên vê bi-harê salewext geştir bike." (Hejmar 6/11)

Xwendevanek dilşahiya xwe wiha nivîsandibû:

"Em ciqas spas bikin, hindik e. Lewra hewe kovarek derxist ku ana em jî karin bibêjin kovarek me jî heye. Em karin bibêjin ku em misilman in; em misilmanen terefdarê mezlûman in û neyarê zilm û zorê nin" (Hejmar 3/28)

Birakî me jî hîsên xwe wiha derxistibû derive:

"Bila zâlim bizanibin ku em jî hene. Li hember wan serî bilind dikan û têkoşîn dikan!" (Hejmar 6/14)

Hozanek jî dilşahiya xweiha anîbû ziman:

"Mizgîniyek şérîn hate guhê min:

Kovara Nûbihar tête weşandin

Sivik bûn keser û kul û derdê min

Birînê dilê min hatin kewandin" (Hejmar 2/27)

Misoger dilê bişewat, çawa hênik kiribû, dilê dijmin û zâlim jî wisa şewitandibû.

Nûbihar bi derketina xwe him di dîroka Kurdên Tirkiyê de û him jî di nav misilmanan de tabûyek mezin şikand û rohnî da. Ev rohnayiya wê ne tenê di tixûbê Tirkiyê de ma. Li çarmandorê sinorê Tirkiyê rohniya xwe nîşan da.

Di hola xwe de, xwe da pejirandin. Di rojnamegeriyê de kovarek xwe bide pejirandin, ne tiştek hêsan e. Nûbihar vê yekê bi serkeftî pêk anî.

Nûbihar bi ramana xwe, naveroka xwe, zimanê xwe, xebata xwe, tîprêzî û pergala rûpelên xwe (mîzanpaj), xwe daye pejirandin.

Nûbihar di nava sê salan de, di zêdeyî hezar û sêses rûpelên xwe de, nêzîkî hezar nivîs û nivîsarê sêses kesî weşandiye. Hemû bi kurdî. Nameyen xwendevanen najmêrim.

Nûbihar di ti rûpelê xwe de ji prensîbên xwe neqeti-yaye.

Nûbihar li ser pir dabaş û meselên civakî û zanyarî rawestaye. Ramanê xwe di çerçewa prensîbên xwe de râber kiriye. Hemû hejmarên we, delîl vê ne.

Nivîsên ku tê de hatine weşandin, pespaye (besit) nîn in. Hinek carna ji bo fehîkrîna nivîsan, di hola xwe de pisporî dixwazin. Bi zanyarî, felseffî, edebî, civakî hatine nivîsandin. Di van nivîsan de

asoya ramanê xwendevanen fireh dike. Wan sewqî fikrandinê dike.

Me gotibû ku di plî babatan de nivîsandibû. Aha ji we re sernavê hinek babeten: Mirov, ol, ziman, netew, zanebûn û nezanî, hilbijartina siyasî, ronakbîr, amojkarî, pirsîgirêka Kurda, pirsîgirêka Bosna, dagirkeriya Israîl, qencî û neqencî, serhildan, hec û Qur'an û...

Kovara Nûbihar di pir rojname û kovaran de ji xwe da ye qalkirin û nivîsandin. Ev ji delîlek e ku xwe daye pejirandin.


Ji xeyrî weşanê, xebatê hêja yê din jî kiriye. Wek sempozyuma "Çareserkirina Pirsa Kurdi", tertîba hinek pêşbaziyan, li ser tîpêk kurdî pêşniyazên nû. Ewê van xebatê hêja jî neyên jibîrkirin.

Nûbihar çawa bi naveroka xwe û bi xebatê xwe, xwe îsbat kiriye, wisa jî bi berg, tîprêzî û mîzanpaja xwe jî xwe îsbat kiriye. Di van awayan de jî ji kovarên hemdemên xwe paş de nemaye. Sal bi sal xwe guhertiye û bi pêş ve çûye. Xeletiyê nivîsandina tîpan, hema hema qet tineye. Rûyê nivîsan jî ji çav re pir xweş tê. Mirov aciz nake. Bêrgên wê bala mirovan dikîşîne ser xwe û bi nihertina ti bergê, mirov rûyê xwe tîş nake.

Ez karim vêya bi hesanî bibêjim ku li Tirkiyê Nûbihar di hêla xwe da kovarek bêhemta ye.

Bi astengiyê aborî, belavkirin û imkana tiştên ku ji dest hatiye, zêdetir kiriye.

Ez bawer im wê di destpêka sala çaremîn de Nûbihar zêdetir bi pêş de here. Him di naveroka xwe û him di aliyê din de. Lî pêwîst e ku em lê xwedî derkevin. Dilê dij-



9. Yekiti fedakariye dixwaze

minên heqiyê reş bikin. Kovarên bi zimanê xwe bêxwedî nehêlin. Ew zimanê gelê menin. Ji dêvla me ve diaxifin. Ku em dixwazin em biaxifin, gel biaxife, emê van weşanê xwe bidomînin.

Di weşanê de salvegeriya sêyemîn a Nûbihar pîroz dikim û temenek dirêj ji Rebbê xwe yê mezîn niyaz dikim.

Tuyê tim bijî Nûbihar!

•••

◻ Yılmaz Çamlıbel:

Dewra Osmaniyan da di medresêñ kurda da, şagirtêñ kurd him ola îslamî, him jî tarîx û edebiyata kurdî fêr dibûn. Di van medresan da gelek şâîr, edip û dîrokvan gîfîştin. Bi destêñ van mirovan, di nav gelê kurd da, rûhiyeta kurdatiyê pêşva çû.

Piştê damezandina Cumhuriyeta Tirkîyê, ev medresan hatin girtin. Bi zimanê kurdî xwendin û nivîsandin hat qedexekirin. Li ser gelê kurd asîmîlasyonek dijwar dest pê kir.

Bo vê sebebê di nav mislimanêñ kurd da li ser problemêñ netewî xebat hêdî hêdî paş da çû.

Lê piştê 1960 da di nav pêşvarû û sosyalistên kurda da li ser problemêñ netewî û karkeran da xebat dest pêkir û pêş da çû.

Lê mixabe mabeyna sosyalist û mislimanêñ kurd da dîyalogek biratî û hevaltî nehate damezrandinê. Ji bo vê kîmasiyê keدا kurdêñ îslamî û sosyalist nehatin cem hev. Yekîtiya xwendevanêñ kurd cênebû. Ev kîmasiyek pir mezîn bû.

Bi weşandinâ Nûbiharê dengê mislimanêñ kurd ên welatparêz cardin bilind bû. Xeynî vê, mabeyna misliman û sosyalistê kurdan da dîyalogek biratî dest pê kir. Lew-

ra Nûbihar him li ser problemêñ netewî, him jî li ser problemêñ olî disekine. Saya Nûbiharê sosyalist û mislimanêñ kurd nêzîkê hevdû bûn. Ev wesfa Nûbiharê ji bo kurda tişteki giranbuha ye.

Wesfek Nûbiharê ji ev e ku bi alfaba latînî û bi zimanê kurdî derdikeve. Ev jî xizmetek bingehî û dîrokî ye. Bi alfaba latînî derketin jî pir muhîm e. Berê mislimanêñ kurd bi alfaba erebî, çepêñ kurda jî bi alfaba latînî dinivîsandin. Ev alfaba cuda, xwendevanêñ kurda jî hev cuda dikir.

Nûbihar ev dubendiyê ji holê rakir. Xwendevanêñ kurda anîn cem hev. Ji bo yekîtiya kurda ra xizmetek mezîn kir.

Belê wek her tişti kîmasiyen Nûbiharê jî hene.

Îro li Tirkîyê kapitalistên kedxwar, ji bo sazumana xwe ye kevneperek, ola îslamê ji xwe ra kirine alet. "Türk Islam sentezi" da jî xuya ye ku ola îslamê li bin bandora kapitalistên tırka ye. Ev ne dîndarî ye. Ev nijadperestî ye. Gerek Nûbihar ser vê meselê

daha xurt raweste.

Nûbihar li ser problemêñ jiyana aborî da zêde nasekiñe. Sazumana dewleta tirk li ser kedmêtinê hatiye avakirin. Karbidestêñ tirk xwîna kurda dimije. Gerek Nûbihar ser van mesela daha zêde bisekine.

Li gora min Nûbihar zehf cîh dide şîra. Hinek cîh bide kurteçîrok, serpêhatî, mese-lok û pêkenî, dê hîn baş bi-be.

Nûbihar gerek li ser meselîn olî, aborî û netewî lêkolînan bike û pêşkêşê xwendevanêñ bike.

Lê dîsa ez bi dilek rehet dibêjim ku Nûbihar dengêk nû ye. di nav jiyana kurda da rewşek giranbuha ye.


Ez bi dil û can sersaliya Nûbiharê pîroz dikim. Ji Nûbiharê ra xweşî, geşî û serketin dixwazim.

•••

◻ Süleyman Aktürk:

Béguman ez dikarim bibêjîm ku berya derhatina Nûbiharê jî pir kesen misliman yêñ kurd dixwestin ku kovarek kurdîya îslamî derxînin û pir caran li ser vê meselê gengeşî jî çêdi-bûn. Lîbelê Nûbiharê ji nedîde bi derhatina xwe dawiya van gengeşîyan anî. Bi bingeha xweyî saxlem, bi çend hevalê fedakar derhat, ser seran û ser çavan tu hat.

Di çapemeniya kurdî de cihê Nûbiharê bi prensîben xwe yêñ îslamî ve tê naskirin. Çawa ku navê xwe ji pirtûka Ehmedê Xanî sitandibe û wek Nûbihara Piçûkan mutewazî, destpêka bi besmelê riza Xwedê Teala daye pêsiya xwe û ji gelê kurd re bi gihadîna mesajîn xwe buye mekteb. Ev mekteb sê sal e bêrawestan dimeşe. (Sê sal ji bo



10. Yê ku azadiyê nede dîgeran, ne layiqê azadiyê ye

kovareke kurdî, ne hindik e. Ji aliye pir kesan ve derhatin û sekinandina weşana kovareke kurdî bi hev re hatiye fam kirin.) Bi gelekî sê salên din ez hêvîdar im wê weşana xwe bi serfirazî, bidomîne.

Nûbihar ji sê salan heta niha ji bo çanda kurdî ci kiriye? Divê kijan berhemên kurdî yên edebî bi zêdeyî di rû-pelên xwe de cih bidanayê? Li gor min ji hejmara yekê heta hejmara heştan, di bin navê "Ayetname" de meala Qur'ana Kerîm bi kurdî xebateke hêja hatibû kirin û ev ji bo çanda kurdî xebateke geleki biqîmet bû.

Ez bawer im pêşî ez, pîr kesen misliman li bêriya vê xebatê ne.

Bi ya min di kovara Nûbiharê de weke ku berhemên edebî yên kurdî tenê şîr xuya dike. Mirov hêvî dike ku bi kurdî jî çîrok, roman û rexneyên li ser muzîk û sînemayê bêne nivîsandin. Ji bo min ev kêmasiyeke mezin e. Li vir divê mirov zêde Nûbiharê jî rexne neke. Li ser vê gelo mirov dikare bibêje ku nivîsen ji Nûbiharê re têz zêdeyê wan şîr in. Kesén ku bi nivîsen xwe alîkariya Nûbiharê dikin, bila qîmetê bidin nesrê jî. Lewra kurdî zimanekî pir fireh e. Û zimanê kurdî ji bin barê hemû berhemên edebî dikare derkeve. Di vê mijarê de bi gelek nimuneyên edebî ve qîmeta zimanê kurdî li holê ye.

Ez bi vê mebestê, bi dilgermî salvegeriya Nûbiharê pîroz dikim û jê re hê salên dûvdirej hêvî dikim.

...

Yakup Karademir:

Kovara Kurdî Nûbihar Kwej ji navê wê jî diyar e ji kûrahiya dîrokê, ji Nûbihara Ehemedê Xanî ya

berya nêzîkî sêsed sal tê û binaferoka xwe jî wek bihara nû dewlemend û rengawreng e. Her wiha bi tîpêx xwe jî li ser şopa Celadet Bedirxan e û nûjen e.

Wek di Kurmanciya jêrîn (Soranî) de tê gotin; "Zikî jin bustan e"ango jinek esmer dikare zarokek gewr, yek gewr dikare yek esmer bêne. Îja em jî dikarin bêjin qada netewî bîstan e, her cure mîwe dike. Helbet her mîweyek wek zarokên dayikekê bi mezinbûn û biçûkbûn, bi reng, bi şekl û şemal ji hev cuda ne. Ev yek dewlemendiyek e û her wiha daneke suruştî ye. Çin û tuwêjîn netewî wek kevirêndîwarekî ne, yek yekî digre û hev temam dikin. Dema tu kevirekî ji vî dîwarî derxî, wê nêvcî bimêne û hilweise.

Ev rewşa li jor şirovekirî şewqa xwe dide çapemeniya netewî jî. Ji bo wê jî em dikarin bêjin Nûbihar wek xuhêن xwe; Armanc, Welatê Me, Ronahî, Roj û hwd. nîhîtek ji yên dîwarê netewî, zarokek ji yên yek dayikê ye. Bi bîr û baweriya xwe ya cihê, valayıekê

tije dike, kar û xebaşek mezin ji bo ziman, wêjê, çand, folklor û toreya netewa Kurdî dike.

Wek Mamoste Beşîkçî dibêje, "Lozan ji bo Tîrkan gelek tiştî ifade dike, jî bo wan serkeftin e, lê ji bo Kurdan fermana nemanê ye." Her wiha reformen M. Kemal jî, heta radeyekê ji bo gelê Tîrk belki qîmetekî wan heye, lê ji bo gelê kurd heman tiştî ifade nakin. Çunkî hemû, hewl û têkoşana Kemalîstan li ser esasê mandelkirina mafêñ gelê kurd û asîmlâsyona zimanê kurdî bû û îro jî wiha ye. Yanî meriv dikare bêje sedemek ji yên reforma guher-tina herfîn erebî jî ji bo ji hev tênegîştina Kurdîn Bakur û Başûr e. Wek Prof. Dr. Marûf Xeznedar di hevpeyvîneke li gel kovara Medya Guneşî de dibêje: "Dema şoreşa Şêx Mehmûdê Berzençî, salên 1930 û biryara dersdayina bi zimanê kurdî ji ali hukumeta Iraqê ve hat kebûlkîrin, M. Kemal ji wan xwest ku xwendin û nivîsandin bi Kurmanciya jêrîn be û ev daxwaz hat pesinandin." Wateya vê helwestê ew e kû Kema-list bi dabeşkirina Kurdistanê û civata Kurd nehatine ser û xwestin ziman û çanda kurdî jî ji hev bi dûrxin. Anglo mebest ew bû ku Kurdîn Bakur ku bi kKurmanciya jorîn diaxîvin ji yên Başûr tê neghêن. Bi guherandina alfabetê jî xwestin me ji bermayê me, ji mîratê me bêpar bihêlin. Nûbihar bi wergera ji Kurmanciya jêrîn, her wiha ji zimanê Erebî, Farisî, transkripsiyona ji tîpêx erebî fêdeyek mezin dîghîne zimanê kurdî, edebiyat, folklor û toreya Kurdî dewlemend dike. Çunkî li ser dîrok, edebiyat û zimanê kurdî gelek ber-



15. Gereke kurd ji bi mekteb û medrese bin

hemên bi Erebî û Farisî hene. Wergera van berheman ji bo cilêن nû pir girîng e. Her wiha bi Kurmanciya jêrin û bi tîpêن Erebî jî gelek berhem hatine afirandin. Transkripciyona ji tîpêن Erebî û transfera vî bermayî ji Başûr ji bo Bakur grîngtirîn kar e û ji bo pêşveçûna çanda Kurdî xebateke pir mezin û hêja ye.

Bi saya Nûbiharê ye ku em navê Baba Tahirê Uryan dibîzin, dîsan bi saya wê em çarînê Omer Xeyam bi kurdî dixwînin. Ev ne tiştekî hindik e.

Bi hêviya berdewambûna vî karî em serkevtin, serbilindî û temenekî dirêj ji bo Nûbiharê û weşanên ku xizmeta çanda Kurdî û tevgera rizgarîxwaz dikan re dixwazin.

•••

◻ Zeynelabidîn Zinar:

Nûbihar xwençeyeke renğîn e ku ji Gulistana Ehmedê Xanî fidiqiye, herweha vîn û daxazên serokê nemir ên Mele Seîdê Kurdî ye ku wî ew di dawiya dehyeka serê vê Sedsala Bîstî de pêşkêsi mirovatiya dinê kiribûn.

Nûbiharê çendî ku jiye xwe yê ber bi çav gihandiye sê salan, lê jiye nave-roka wê duwazdeh hezar sal in ku li navenda Rojhilata Navîn hêwirî ye û ku nîşana xwe digel ci-yayê xwe yên berz bi giştiya dinyayê daye nîşandan.

Bi derketina Nûbiharê rind hate peyitandin ku êdî Neteweyê Kurd jî dikare mezeya pirdengiya mirovatiye bike û her çînek ku li welatê xwe, li ni-jad û neteweyê xwe, li ax û azbata xwe xwedî derbi-keve. Lê belê pêdivî bû ku Nûbihar sih sal berê dest bi weşana xwe kiribûna. Erê mixabin hin caran şev têne lêgerandin û rê ji re

nayêne derxistin. Lî niha êdî roj bi qîmê derketiye, çav bi ruhniya xwe helebez bûne, mejî di taristana gemarî de tiştan zû kifş dikan û rind jî hatiye zanîn ku êdî mast ji şîr çêdibe.

Nûbihar bi têbînî û baweriya xwe ya zelal li pêşberî hemû dîtin, bawerî û fîkrîn cu-da gelekî bi semax e. Ji ber ku di dîtin bîrûbaweriyyê xwe de ne hişkegirê, zikreş û tofanîk e. Herweha ew xwediyê berpirsyariyeke hûr û kûr e. Ji ber hindê jî ew dilê pir kesan xweş dike, xeydokan zû şad dike û hovan jî pir ditirsîne, welê ditirsîne ta ku di xewê de jî bizda xwe li ser kevçika dilê wan dike hişkegirê.

Payebilindiya herî berz a Nûbiharê ev e ku xwerû bi zimanê kurdî derdikeye û ku bi alfabeşa latînî jiyana xwe di-domîne. Erê çendî ku heta niha jî Nûbiharê xwe ji devokê herêmî ne fitilandîye, lê ev yek ji 35 hejmaran re û bi temenê xwe yê sêsale, tiştekî pir normal e.

Dîtinê nivîskarê Nûbi-


harê kesî girênadîn. Lî kule-kî û lengîa rêzmanî yêñ di Nûbiharê de, xisarê digehînin her kesî. Herweha bikaranîna bêjeyêñ biyanî jî giranbihatiya wê çend kêt da-dixîne jêrê. Ji ber hindê hêvîdar im ku berpirsyarê Nûbiharê hîn zêdetir xem bix-win û zîrektiya xwe nîşan bîdin. Ji ber ku zimanê kurdî pir dewlemend e, lê atara 73 salêñ hovane hêvîdar im ku careke din bi ser ve neyê. Bi-la zimanê kurdî jî nekeve rewşa zimanê tirkî ku ji "is" û "dir" an hatiye holê.

Bi umûda bixwebaweriyyê, hêviya serkeftinê û bi şadiya serfiraziyê...

•••

◻ Fırat Cewerî:

Ev sê sal in, ji bilî hin tesâdufan, kovara Nûbiharê her meh bi rêk û pêk digihîje min. Ev rewşa han, Nûbiharê weke kovareke cîdî dide nîşandan. Li welateki mîna Tirkiyeyê, di şertêñ ewqas zehmet de, derxistina kovareke xwerû bi kurdî ne hêsan e. Ez dikarim bê dudîlî bibêjîm ku ne berê Cumhûriyetê, ne jî piştî Cumhûriyetê kovareke xwerû bi kurdî, sê salan bê navbir dermeketiye. Ev yeka han jî hem cidiyeta kovarê, hem rola wê, hem jî girîngiya wê di-de xuyakirin. Ew carinan ji min re mîna bermayeke Ehmedê Xanî tê, bêhna Nûbihara wî ji nava rûpelîn Nûbihara îroyîn di-fûre. Taybetîbûneke din ya Nûbiharê ew e ku ew ji aliye rewşen bîrêñ kurd yêñ musulman ve derdikeye. Mîna tê zanîn, iro, digel hebûna kurdêñ êzîdî, piraniya gelê kurd musulman e. Heta niha, serdesten kurdan, dînê İslâmî jî mîna çekekî li hemberî gelê kurd bi kar anîne û gelek caran kur-



20. Hec serhildan e li hember zaliman
ü beraet e ji kafir ü müşrikan

dan di bin nav û siya dîn de hevdu kuştine, birinê kûr di civata xwe de vekirine. Lê Nûbiharê di van sê salêن xwe yên weşanê de perdeya ser çavêن dijmin hilaniye, fen û fût û derewên wan derxistîye meydanê. Bi ya min, Nûbihar di politikaya xwe de jî liberal hereket kiriye. Ev jî ji bo wê poaneke erînî ye. Yanî tiştê ku min heta niha ji nîvisen Nûbiharê fêhm kiriye, ew ne bawermendê kor yên ideolojiya İslâmî ne, lê belê musulmanê kurd yên pak in. Wan nedane dû ideolojiyên ekstrem û fanatîk, lê belê demokrat û bi tolerans dixuyin. Ger Nûbihar mîna kovareke xwerû bi kurdî, kur-dîtiyê bingeh bigire û li hemberî kurdén ku cihê difikirin bi tolerans be, wê xurttir bibe, bipêşdetir here û ji bo his-yarkirina kurdan û geşkirina ziman û edebiyata kurdî roleke mezentir bilzê.

Ez sêsaliya Nûbiharê ji dil pîroz dikim, ji hemû xebatkar û kedkarên wê re jiyanek serfiraz û pêşerojeke rohnî hêvî dikim.

...

◻ Latif Özdemir:

Digel silavên birayane û dilinî, pîwîst e ku bêjîm, xweşhal im ku derheqê Nûbiharê de mecal heye çend tişt bêjîm.

Bi rastî kovara me ya nû Nûbihar, valahiyeq mezin bi qederê qeweta xwe dadigre. Tewra piraniya milletê kurd hewcîyê kovarek demokrat û İslamî bûn. Lazim e ku pîrsa kurdî ji hemû aliyan ve bi başî bê şirovekirin. Yek jê jî, aqide û dîn e.

Lazim e kurd bizanin ku gelo dînê İslâmê çi feydeyek dide millet. Nûbihar pêş hemû tiştî ne di raya resenî de ye. Nûbihar welatperwer û bînfi-

reh e. Diyar e îmkanê kovarê gelek kêm in. Lê siyane ta kovarê, rûmeta kovarê gelek zêde ye.

Ez hemû hejmarê kovarê dixunim. Li gor min Nûbihar ne biyanî ye, ewladek e ji ji yana malbata gelê kurd.

Helbete kêmasiyê kovarê jî hene. Jibo zelalkirin û rona-hîkirina tarîxa kurd û Kurdistânê lazim e lêkolînên baş di rûpelan de cih bigrin. Zêdetir resm û wêne kovarê bixemîlinin. Xencî helbestan, berhemên din yên edebiyatê jî di rûpela de hebin. Kes û şex-siyetîn kurd yên navdar, zaniyar û lêzan di derheqê pîrs û pîvanan de daxuyaniyan bidin kovarê, yan jî kovar bi wan re hevpeyînan çêke.

Hêvîdar im ku kovar bibe handerê (teşwîqgerê) per-werdebûna zimanê kurdî û rîya xortên nivîskar ronahî û xweştit bike.

Serketin ji xebata we re.

•••

◻ Bedirxan Epözdemir:

Pîroz be sêsaliya Nûbihar ra me.



21. Di nav ronakbirêñ kurd de danüstandin û pêwendî sert e

Wek tê zanîn çapmeniya kurdî di gelek konaxêñ dijwar da derbas dibe. Wek kovareki çandî, hunerî û edebî Nûbihar jî, bêguman para xwe ji van dijwariyan digre. Tenê ku meriv van astengan bînê ber çavên xwe, sêsaliya Nûbiharê bi serê xwe ji bo wêja kurdî bûyereke gelek giranbuha ye. Her wuha ev temen bûyereke pîroz e.

Lê pir mixabin ku hêja jî gelek rewşenbîrêñ kurda, bi rengeke zanistî û edebî na-veroka rexne û rexnegiriye fêm nekirine. Ev kêmasiyekê gelek girîng e. Rexnekirin, ne reşkirin e. Her wuha ne pesin û methe jî. Pêwîst e rexne, di sefika zanistî û edebî da derbas bibe. Anglo di rexnê da ciyê hissiyat û hesûdiyê tune ye. Rexnevan gerek pisporê karê xwe be. Rexne, pêwîst e pêşıya astengan veke û pîrsên girîng ronahî bike.

Ku meriv di wê çarçova jörîn da bi kûrtî jiyanâ Nûbiharê hilîne ber çav; emê bibînin ku, di vê demê da bi naverok, bi form û xebatêñ xwe yên din Nûbihar, gelek kareke pîroz anîye holê. Vaye ku gelek pîsegirikêñ wêja kurdî zelal bike. Di aliye werger, ziman, helbest û wêja kurdî ya kevnar da gelek karên hêja kiriye. Nûbihar, ciyê xwe di baxçê dîroka edebiyata kurdî da ji nûha va girtiye. Domandina sê salîtenê bi serê xwe serketinek e.

Bêguman karê Nûbiharê wusa hêsan nîn e. Hêja gelek problem û pîsegirikêñ edebiyata kurdî li holê ne. Pêwîst e ev bêne pişkaftin. Ev bar li ser milê edebiyatzanêñ kurda û her wuha li ser milê Nûbihar e. Sedem ku Nûbihar bikaribe ñî heqê vî barê pîroz da bê, pîwîst e ku bi bêñfireh karê xwe bidomîne, dor û tirafê xwe

fireh bike, pirdeng be û xwe di nava çarçoveke teng da nefetsîne. Nûbihar gerek bibe pir di navbera rewşenbîrêndi kurda da. Cih bide edebiyata kurdî ya nûjen. Pirs û lêkolînêndi edebî yên teorîk bîne ziman. Xortan teşwîqê niví-sandinê bike. Valeyiya ku di warê edebiyata zaûkan da heye tijî bike û weşanan biwesînê. Li gor mercen xwe mehîcan û koçmên (yarışma) edebî pêk bîne.

Mînak; roja helbestan, koçma nivísa kurteçirokan. Diyar e ku ev hemû girêdayîne bi heyin û pêwendiyêndi zindî. Pêwîst e di serî da evana bêne çêkirin.

Eva ev in bi kurtî dîtin û pêşniyarêndi min.

Min pir got, ne? Çiqas gotin hêsa ye, kirin zehmet e. Lî ez amade me ci bikeve para min, hûn dikarin bidine ser milê min.

Dê destê we xweş be, riya we vekirî be...

Pîroz bî sêsaliya Nûbiharê. Pir sipas.

•••

Feqî Huseyn:

Berî bersivdana vê pirsê, dixwazim bîr-hatinek xwe pêşkêş bikim: Di sala 1960an da profesorek 8 zimanzanê Amerîkî rastê min hat. Ji wan 8 zimanan yek jê zimanê Kurdî û nemaze zaravayê Kurmancî bû. Zehf nekêşa di navber me da nasîn û hogiriye hate himatê. Di gelek deveran da û li ser gelek heyberan me gengeşî dikir. Xwezay bi gengeşîyan ra pirs û bersiv jî hebûn. Ji rojan rojek mijara me Dîwana Melayê Cizîrî bû. Piştî xwendina çend beytek, nişka ve serê xwe rakir û li nav çavêndi min nihêri, "Dixwazim pîrsa Dîwana Melayê Cizîrî ji te bikim. Dîtina te

di derbarê Dîwan û edebiyata wî da ci ye?" got û benda bersiva min rawesta. Min dayê serê xwe rakir, destê xwe avête Dîwanê ji ser mêtê hilâda, du-sê caran hejand û "Seydayê hêja, tu dizanî ku ez netewperwer û welat-parêzekî Kurdistanê me û dîsa tu dizanî ku li ber çavêne pirtûkek min heye, ew jî ev Dîwan e. Heger di derbarê wê de ponijîn û dîtinan derpêş bikim, ezê çiqas bikarim xwe ji seheka netewî dûr bixim. Ya rast, ji vê pirsê ra bersiv nedan û huşbûn e." min got û ez jî manendê wî rawestam.

Ji wê rojê heya niha di bin piran ra gelek av dervaz bûne, gelek heyber guherîne û cihan gelek pêşve çûye. Lî mi-xabin pirtûk, rojname û kovarêndi ji ciyêñ xwe yên kevnare hindik livîne. Dikarim bibêjim, çapemeniya ku dabaşa Kurdan û doza Kurdistanê dîkin hene. Belê ev rastiye e, heçî heyinê hene, lê him hejmara wan hindik in, him jî ne bi zimanê Kurdî ne.

Di vê dema kêmasiya ça-


pemeniya bi zimanê Kurdî da, derketina kovara Nûbihar bûyerek pir mezin e û xwerû bi Kurdîbûna wê di bin xwe da bi hezaran kêmâsi û çewtiyan winda dike. Dikarim bibêjim ku berçavkek "kêmasînebîn" dide ber çavêne we-latparêzan. Bi awayek din dibêjim: Di van deman da nemaze di Tirkîyê da derketina kovarek mîna Nûbiharê bi serê xwe, ji bil naverokê jî xizmetek bêhempa ye. Çawan ku seydayê mezin Ehmedê Xanî jî gotiye:

"Ev meywe eger ne abêdar e Kurmancî ye ew qeder li kar e"

Derketina kovaran dikarim di 2 sedeman da bicivînim û şirovekim: 1- Ji bo havilê derdikeve û heger xizmet jî bike baş e. 2- Ji bo xizmet derdikeve û heger havil jî bide qenc e. Ez kovara Nûbiharê di rewşa duwemîn da dibînim. Heger di rewşa yeke-mîn da bibûya niha zû hatibû dadan. Lewra çawan weşanen bi Kurdî hindik in, wusan xwenda û kiryarêndi wan jî hindik in. Ji ber vê yekê heger Nûbihar bi alaza havilê bihata weşandin, bi vê rewşa pîroz heya iro nedikariya jîna xwe bido-manda.

Xizmeta kovara Nûbiharê, ya ji bo çand, hûner, ferheng, dîrok û edebiyata Kurdî pir hêja û mezin e. Hemin e ku bi gor mercen iro jî xaza wê ya siyasi gelek dirist e. Nemaze ev xaza dirist ku ji alî dîndaran ve be, şayanê balkêş e. Dixwazim ev gotin, çewt neyê têgi-handin. Dîndarêndi me (awartî ne têda) ewen ku doza Kurd û Kurdistanê bi pejiranda tune bûn û pêşber jî derdiketin. Vê yekê xorten Kurdistanê yên tor derdixiste pêşber dînê pîroz.

Her çiqas ji wan ra,



22. Hûn pir xapiyane,
nexwe hevdû nezapînin

"Dînê İslâmê ne ev e, di dîn da hemî mafêni mirovanî yê hemî kesan heye" dihate gotin jî, tu kesî bawer nedikir. Lewra bi çavêni xwe dijberiya wan dîndaran didîtin û disilikîna. Li navber dîn û xorten nûciwan da peywistîya pirekê hebû. Vaye kovara Nûbiharê digel nivîskar, xwendevan û sempatîzanen xwe, ev peywir (wezîfe) jî hildaye ser xwe û bi rewşek tekûz dimeşîne. Hêvîdar im, dê heyâ dawî jî meşa xwe bido-mîne.

Bi sazî derketina Nûbiharê, standartiya wê û hejmara rûpelan, ne ketina bin bandora bûyeran û ne guhertina bereka (îstîqameta) xwe, derneketina ji çarçova jê ra hatî kifşkirin û ji hejmara yekemîn heyâ siyûpêncemîn di binyata xwe da tekûzbûn û pêşveçûna Nûbiharê, neqandina min ya pêşîn e.

Jî nivîsên nivîskaran derencek guhertîtir kêfa min jî yê Sabah Kara ra û ji hemî nivîsan jî zêdetir kêfa min jî nivîsên wî yê "Ferhenga Semantika Zimanê Kurdî" ra hat, lê mixabin pir nedemand. Heger derfet û merc dest bide, cardî bîkeve jîna weşanê, dê gelek havil bide.

Kêmasiyêni kovara Nûbiharê ji kêmasiyêni gellementî zêdetir ber çavê min neketine. Ew jî piraniya wan ferhengî, rîzimanî û rastnivîsi ne ku di nivîsên me hemiyan da jî ew dixwiyyê. Lê divê li diristkirina vê em bixebeitin.

Min qet hezir nedikir ku ezê bikaribim kovareke Kurmancî nemaze ewê di Tirkîyê da derketî ewqas rexne bikim.

...

Lokman Polat:


Ez qedandina sésaliya Nûbiharê pîroz dikim

û jê re di jiyana weşanê de temenekî dirêj dixwazim.

Nûbihar kovarek welat-parêz e. Nêrinêni kovarê wek yê İslamiyêni (oliyêni) Tirkan nîne. Ji wan gelek cuda difikire. Ev jî tiştekî gelek baş e. Li welatê xwe, li gelê xwe, li zimanê xwe, bi kurtayî li nas-nama xwe ya neteweyî xwedîderketin tiştekî gelek girîng e. Ferqiyeta Nûbiharê ji hêzên olî yek jê jî ev tiş in û ev jî tiştên gelek baş in.

Sê sal bêrawestandin bi zimanê Kurdî berdewamkirina weşanek, kar û xebateke hêja ye. Nûbiharê bi jiyana xwe ya weşanê, di gelek aliyan de ji bo zimanê Kurdî û gelemeprîji bo doza netewa Kurd xizmetek kiriye.

Kovara Nûbiharê di jiyana xwe ya weşanî de êrişî hêzên Kurd yê çep nekir, he-ta karibû bi wan re dostanî, destbiratî kir. Nûbiharê wek hinek kovarêni ku ji xwe re "lîberal û demokrat" digotin, rexneyen tûj li sosyalistîn Kurd negirt; sosyalistan nekir "bizina gunehkar" û çîrê



26. Ji neqenciyê sûsistîfade nabe, Lê Ji Qenciyê sûsistîfade dibe

sosyalîstan nekir. Xwe dûrê sosyalîstan neda, ji wan ne-reviya, bi çavê dijminatiyê li wan mîze nekir. Ev jî helwestek gelek pozitîf bû.

Kovara Nûbihar rûpelên xwe ji hemû nivîskarêni Kurd re vekir. Ez jî tê de, gelek ni-vîskarêni Kurd yên ku ji xwe re sosyalist dibêjin, di Nûbiharê de nivîs weşandin. Nûbiharê bi gelek nivîskarêni Kurd yên çep re hevpeyvin çêkir. Berpirsiyare Nûbiharê di rojnameyêni Kurd yên sosyalist de nivîs (maqale) nivîs. Bi rastî jî, wexta ku min nivîsên sosyalistan di Nûbiharê de û yên Sabah Kara jî, di kovar û rojnameyêni sosyalistan de didîtin, gelek keyfa min dihat.

Dijminahiya hevdu û birakujî zirarek gelek, gelek mezin daye netewa Kurd. Divê pêşîya hemû tişti partî û rîexistinêni Kurdan bi hevdu re destbiratî bikin. Di nav eniya netewayî de cihê her hêzêkî Kurd heye. Sosyalist, oldar, liberal, demokrat, kî xwedanê ci nîrînê dibe bila bibe, di pêvajoya têkoşîna netewayî de hewcedariya wan bi hevdu heye. Divê em hemû li dij dijiminê dagirker di nav yek eniyê de bênen cem hev, mil bidin milê hev û têbikoşin.

Ez di vê hêviyê de meku, ji vir û pê de jî dê kovara Nûbihar helwesten xwe yên qenc (ku min li jor behs kir) dê berdewam bike û ji bo dostaniyê, ji bo biratiyê, ji bo hevkariyê, dê wezîfeyen xwe bînê cih, bi her awayî doza gelê kurd biparêze û ji bo pêşveçûna çand û edebiyata Kurdî, zimanê Kurdî, xizmet bike.

Ez carek din ji kovara Nûbihar re jiyanek dirêj dixwazim û sésaliya kovarê pîroz dikim.

...

■ Mihemed Dehsiar:

Weke ku tê zanîn, nete-
weyê kurd bi sedsalan
di bin pîkolî û zordariyên
mêtîngehkaran de hatiye per-
çiqandin; dewletên sitemkar
xwestine ziman, çand û ede-
biyata kurdî, bi giştî û bi
awayên qirêj û gemarî bidin
jibîrkirin û bi vî awayî ji holê
bidin rakirin. Ji ber zordestû û
tadeyên koledaran, klasikên
kurdî di refîn xefî de bi salan
terkeserî rizandinê bûne; çî-
rok û helbestên kurdî ber bi
jibîrkirinê ve çûne. Di rewş-
ke weha de, qedexebûna zi-
manê kurdî, çand û edebiyata
kurdî qels xistiye, li ser bi-
karanîna zimanê kurdî tesî-
reke mezin kiriye.

Îcar di rewşke wisan de
ziman, çand, û edebiyata kur-
dî tevî van tadeyî, pîkolî û
zordestiyên bêhempa jî, îro
ji mirinê rizgar bûye, ber bi
rewşke nû û berhemdar ve
dimeşe. Îro li welêt û li der-
vayî welêt, bi dehan kovar û
rojnameyên xwerû bi kurdî
(Nûbihar, Armanc, Nûdem,
Roja Nû, Kurmancî, Welatê
Me û hwd.) derdikevin.

Bê şik ev tenê bi serê
xwe têr nakin û divê ro-
nakbîr, zimanzane û ni-
vîskaren kurd hewil bidin
ku zimanekî yekgirtî û
xweser derxin holê; lê di
rewşke mirin û jiyanê de,
ev kar û xebatêن hêja, ji
bo kurdan û edebiyata
kurdî, serkeftin û serbi-
lindahiyeke mezin e. Tevî
ku zimanê kurdî ji hêla ni-
vîskî û gramerî ve tam ne-
rûniştibe jî, hêvî û bawer-
riyên mezin hene ku di
rojên pêş de hîn bi pêştir
bikeve.

Eşkere ye ku îro kovar
û rojnameyên kurdî, di
pêşketina çand û edebiyata
kurdî de roleke girîng
dileyîzin. Li hember zor-
destî û pîkoliyên dewletên

koledar, wezîfeyên xwe yên
vatinî pêk tînin. Her wiha ji
tevgêra rizgariyê re jî xîzme-
teke giranbiha dikan.

Kovara Nûbiharê jî weke
piraniya kovar û rojnameyên
din ên bi kurdî, di nav çand û
edebiyata kurdî de, xezîne-
yeke hêja û giranbiha ye. Di
bin zordarû û sitemkariyê de,
derxistina kovareke xwerû bi
kurdî û bi taybetî jî li welêt, ne
hêsa ye û sirbilindahiyeke
mezin e. Bi derçûna 36 hej-
maran, Nûbihar serkeftina
xwe diyar dike.

Ji ber ku min tevaya hej-
marên wê bi dest nexistiye,
ez dê nikaribim zêde li ser na-
veroka wê bisekinim. Bi qasî
ku min kovarê ji cem dost û
hevalan bi dest xistiye, ez di-
karim bi kurtayî wiha
bibêjim: Ji hêla teknîkî ve,
Nûbihar gelek ciwan e. Lê dil
dixwest ku kovar hinekî din
qalind bûna û di naveroka
xwe de zêde cîh bida nîvîsên
edebî û danasîna edebiyafê.
Bi ya min hûn ji helbest û şî-
iran re (tevî ku tu şikên min di
derheqa hêjabûn û kaliteya
wan de tune ye jî) zêde cîh

dîqetînin. Wekî din jî çapki-
rina nîvîsên curbecur nîvîs-
karên Kurd, dewlemendiye-
ke kovarê ye û domandina wê
pêwîst e.

Ez bi minasebeta dagirti-
na sê salî û bi derketina 36
hejmarê kovara Nûbiharê,
berpirsiyar û xebatkarên ko-
varê pîroz dikim û di vî karê
hêja û giranbiha de serkeftina
we daxwaz dikim.

Bi silavê biratiyê.


■ Naci Kutlay:

Mîn sê sal berê bi tesadu-
fi kovara çandî hunerî û
edebî Nûbihar ku dît, ez pir
kêfxweş bûm. Min zûtirê li
naveroka kovarê nîhêrî û hê jî
dilgerm bûm. We tiştekî pir
baş kir. Ev nesla nû nizane, li
Turkiyayê merivên dîndar çi-
qas zehmetî û neheqî dîtin.
Hûn hemberî vê dîtinê der-
ketin. Yekê jî di misilmantî-
ya ku li Turkiyayê û siyaseta
wê de hukum dike, misilmantî
û tirkîti tevîhev kiri-
bûn. Misilmanen belengaz ji
xwe ditirsiyan û serda jî, eger
ku ew misilmanen "dîndar"

kurd bin, ew sûcê herî
mezin dihate qebûlkirinê.
Ji bo vê yekê jî we ku dîn,
çand, huner bi kurdî we-
şand, we tirseke mezn ji
holê rakir. Hûn teng nefikirîn,
we bi çavekî nû-
jen li meselan nîhêrî, ez
we pîroz dikim.

We çewtiya misilma-
nen Tîrk wek bîra eşkire
kir û wan çawa Seîdî Kur-
dî û gotinên wî diquli-
bandin şeklekî din, nîşan
da. Ez bawer im rehme-
tiyê Seîdî Kurdî di gora
xwe de ji we re dia dike.

Lê gerek meriv di vî
warî de jî her diçe, tişten
nû minaqeşê bike... Çima
ku li dînyayê niha mes-
selîn girîng têñ xeber-
danê. Mînak, "idantîtî û
dîn", "misilmantî û welat-



27. Xwexapandin: "Tu ji me yi, baş i;
ne ji me yi, ne baş i"

parêzî", "misilmantî û dewlet", "jin û islam". Ez dixwazim ji we hevalên ezîz re bêjim ku, gerek meriv li ser dîtinê felsefi û civakî xeber bide... Dinê û hemû ideoloji gelek têr guhartinê û mina-qeşê kîrinê, lewra gerek "Nûbihar" jî di yalê kurdañ ve teví wan xebatan be.

Serkeftin û serfiraziyê dixwazim.

•••

Zana Farqînî:

"Vi zemanî her kesek
mê'marê dîwarê xwe ye"

Ehmedê Xanî

Ji dema şkêstin û têkçûna serhildanêñ kurdañ bi vir ve, kesen ku doza mafêñ xwe yên mirovî û neteweyî dikirin bi "komunîst" iyê dihatin navandin. Kesen ku bi zimanê xwe dinivisandin, têkoşîna xwe bi zimanê xwe didan, tev di "bereya çepgir" de cihê xwe distandin, her ci tev ne çepgir bin jî. Bi derketina Nûbiharê re, "bereya rastgir" jî cihê xwe di vî warî de stand û dîndarêñ me jî bi zimanê xwe nav di xwe dan. (NOTA

NÛBIHARÊ: Em xwe ji "bereya rastgir" nahesibînin. Ji bo me, ne "rastgiri" û "çepgirî", lê "rastgiri" û "çewtgiri" me'na ifade dike.) Ez bi xwe vê yekê pir girîng dibînim, di gel ku ev gay bi derengî jî hatiye avêtin.

Piştî van gotinan, îcar ez dixwazim li ser naveroka kovarê rawestim. Her çiqas li binê logoyê iþareyên "mehnameya çandî hunerî edebî" hatibin danîn jî, bi ya min, diviyabû ku peyvîn "siyasî" û "olî" jî di nav wan de hebûyana. Ji ber ku, mijarê siyasî û olî tê de cihekî gi-ring digrin. Em dikarin bibêjin ku ji sê payan du pa ji nivîsen wisan re hâtine vejetandin. Di van

nivîsan de divê ez bibêjim ku, sergotara Nûbiharê bêhtir bala min dikişîne. Li ser mijarêñ balkêş têne rawestandin. Lê di wan nivîsan de, dîndarêñ sexte û sextekar baş nehatine eşkerekirin. Bi ser re, ew hatine destnîşankirin bêyî ku nav û partîyêñ wan bêne diyarkirin.

Ji ber ku ez zêde ji nivîsen edebî, bi hemû çeşnê wê ve, fêm nakim, ez naxwazim ku bi kûrî wan binirxînim. Lê ez vî maffî di xwe de dibînim ku, ez bibêjim ji çeşnêñ berhemên edebî, helbest pirtir derketine û piraniya wan jî li gorî qalib û şeweyîn berê ne.

Di nav berhemên ku di Nûbiharê de derketine, xebatek pir bala min kişiçande. Ew jî xebata Kak Sabah Kara ya bi navê "Ferhenga Semantîka Zimanê Kurdî" bû. Ci heyf ku nîvcû ma. Her wiha xebata wî ya bi navê "Parekende" jî hêjayî bibîranînê ye. Hemin me jê behs kir, min di vê ez vê yekê jî daxuyînim. Di her hejmarañ de nivîsen Kak Sabah Kara bi zêdehî dertêñ, hem jî bi eynî navî, jî bilî navê wî

yên mustear. Divê hay ji vê yekê hebe. Nivîsen xwe di kovarê de kêmtir bike wê baştir be.

Li ser zimanê kovarê, li ser rastnîvîsa wê û aliyen wê yên din jî mirov dikare raweste. Lê belê jî ber hindikbûna cih, min pêwîst dît ku ez li ser xalêñ jorê bi tenê rawestim. Em bi tenê li ser naveroka kovarê sekînîn. Astengî, derfet, dijwariyêñ wê yên di warê amadekirina weşanê de me li derveyî nirxandinê hiştin.

Em sêsaliya Nûbiharê pîroz dikin û daxwaz dikin ku gelek sêsaliyên din jî bibîne.


•••

Suut Kılıç:

Ez dixwazim bersiva pirsa we bi vî awayî bidim; bi giştî ez Nûbiharê diecîbînim. Ji ber ku ew her bi kurdî ye û divêt ev bê gotin. Helbet ez dizanîm hûn bi vê bersivê na-gîhîn miradê xwe. Ji bo vê yekê, ez dixwazim çend tiştêñ din bibêjim. Haya min jî astengiyêñ ku derdikevin ber kovarê hene. Lazim e mirov hinekî realist be, lewra li go-

rî min kîmasiya we ya he-rî muhîm, derbarê warê we ye. Li gorî min hûn derbarê islamê, şerîtetê, şîrovekirina Qur'an û hedîsan û helbet tesîrên wê yên roja îro kêm agahiyan didin. Ji ber ku ez bi cavê kovareke islamî li we dinêrim, ez van kîmasiyan dibêjim.

Tiştekî din jî heye, divê (li gorî imkanan) hûn berê xwe firehtir bîkin. Ez wekî şexsekî jî rîzê, bala xwe didimê ku hejmara nivîskar, alîm û lêkolîneran hindik e an jî hindik têr xuyakirin. Ez dixwazim vê bibêjim, ez kovarê bi rêk û pêk taqîb dikim, lê ji ber karêñ min jî şexsî, imakana min a hûrlêne-rînê, ne ew çend pir e. Ji



29. İflasa siyaseta dînî resmî,
mîletî resmî, mezhebî resmî

ber vê yekê jî dibe ku rexneyên mim subjektif jî bin. Feqat wekî ku min li serî got, helbet wê qisûr hebin, lê derketina wê jî serkeftinek e. Hele wergera Mesnewiyê û ya şîrîn Baba Tahirê Uryan, ji xwe layiqî pesindanê ye. Ez wer bawer im hûnê kêmasiya kurdan a derbarê tarixa İslâmî û kultura wê ku bi zimanê kurdî divê bê çekirin jî, wekî wezîfeyek muhîm bînîn cih.

...

■ Ahmet Önal:

Berî her tiştî ez gelek kîfîxwes bûm ku li ser Nûbiharê we vê pîrsiyarê pêşkêşî min kir. Bi dilsozi bersivdayîn ji bo min şeref e. Ez bi kurtî dikanim bêjim ku:

Kovara Nûbihar di aliyê ziman û wêjeya Kurdî de gelek xizmet kir di navbera sê salan da û di vê mercê de balkêşbûna xwe ji xwendevanê xwe ra nîşan da.

Kovara Nûbihar aliyê politikî da jî valayiyeke mezin têr dike ji bo gelê me yê misilman û oldar ra û ev jî pêwîst e.

Çerçeva weşana Nûbiharê, politika wê ya esasî çiqas oldar be jî, em dibi-nin ku gelek caran nivîsîn nivîskarêne ateist jî di nav rûpelên kovara zêrîn da çap dîbin. Tê xwiyakirin ku tehemila Nûbiharê û berpîrsiyarêne wê gelek fi-re ye. Bo vê jî dixwazim kovara Nûbihar her serifraz be û ne sê salan, lê her dem di xizmeta gelê me de ges be.

Bi vê wesileyê dixwazim pêşniyaz bikim ku, di demeke kurt da têkilî û danûstandin di navbera zana, rewşenbîr, weşan-xane û hemû sazumanêne Kurdan de çêbibe. Lewra di vê qadê de gelek valayı heye. Pêwîst e ku em vê valayıyî tijî bikin û di her

alî da kêşeya (mesela) Kurdî bi asanî bersiv û çareser bikin.

...

■ Felat Dilges:

Bî dîtina weşanek Kurdî, bi dîtina rêt û hevokek Kurdî ez gelek kîfîxwes dibim; wekî ku min mîzgîn û diyari-yeke sitandibe ez şâ dibim; dilê min xwes, geş û hênik di-be. Mîna tiyê ku di kîleqij û tava havînê de tasek ava sar a ji kaniyek çiyayê Serhedê, an Andok û Şerefdînê bi dest xistibe ez bi dilovanî radikim weşanên Kurdî. Çimkî ez di nivîsîna bi zimanê Kurdî de gel û welatê xwe dibînim; hêviya min xurttir, berxwe-dana min zêdetir dibe.


Erê ez bi weşanên ku bi zimanê me ne dilgeş dibim; lê belê ez bi qasî vê yekê jî li naverokek dewlemend û zimanek li gor qayide û pî-vanên rîzimanî yê rast jî di-gerim. Di xebata nivîsî de bîr û ramana mirov çiqas rast û mantiqî be jî, heta ku bi awa-yek rast neyê ziman û li ser kaxîz cih nesîfîne, mesaj, dav-

waz û meram bi dirustî nagî-hîje xwendevan û gelek caran çewtnîvîsîn ji şâş fêmkirinan re jî dibe sedem û di-mîne. Bav û kalênen me digo-tin, "Mirov bi piyê xwe bişemite dikare xwe bigire; lê ku bi devê xwe bişehîte nikare xwe bigire." Ev gotina me ya pêşyan çiqas xwes e! Lê belê ez xwe disipêrim bav û kalan û vê gotina xwes bi vî awayî dibêjim, "Mirov ku bi devê xwe şehitî dikare xwe bigire, lê ku bi destê xwe nivîsi ni-kare xwe bigire." Çimkî peyv û gotin diçe, tê jîbîrkirin; îcar nivîs dimîne, dibe belge û di nav rûpelên dîrokê de cih dis-tîne. Pişti ku çap bû ji gel û ji civatê re dibe mal; ji warê subjektifiyê derdikeve, di qa-da objektifiyê de ciyê xwe dis-tîne.

Di warê nivîsîna Kurdî de, nemaze di zaravayê Kurman-cî de em Kurdên Bakûr hê jî di merheleya destpêkê de ne. Bi pirranî ronakbîrên me yênu ku bi vî zaravayî dinivîsîn jî li derive dimînin; keys û riya vegera welat jî ji bo hînekan ji wan tune. Yênu ku niha di-

karin vegeerin welat jî xu-ya ye ku bi pirranî xwe nadîn ber vî "bârî." Ya rast carna hînek bi "tûrîstî" tê, xwe disipêrin çend nivîskarêne Tirk ên Kurdnîjad, wekî ku Tols-toyê Kurdan hin peyvîn mezin dikin û vedigerin warênu ku ji xwe re kirine welat. Ku ji bo "tûrîstiya" wan pêwîst be dikarin hîn ji Tirkêne hov re xiz-metla leşkeriyê jî bikin, lê belê nikarin sê rojêne xwe bidin weşeneke kurdi ya ku bi dijwariyêne mezin li welat çap dibe.

Baş e; ewê di vê rewşê de çawa bibe, divê mirov çawa bike? Kesênu ku eme li benda wan bin û ewe hîn rê nîşanî me bidin, bi destê me bigirin û



30. İhmaleke tarixî: Di İslâmî de heq û hiqûqî miletan

"apîtiya" me bikin tunin. Ge-lo emê çawa bikin? Emê wek Nûbiharê bikin; mîna weşanê Kurdî yên din ên ku li welat çap dibin di ber xwe bîdin; bi bîr û bawerî, bi wela-tevîniyek Kurdistanî li zimanê xwe xwedî derkevin. Di roja xerab, di roja teng de bi bir-yardarî û bi bawermendî xwe bidin ber bar, li rastiya gelê xwe û li zimanê xwe xwedî derkevin. Dijmin çiqas bi ser me de bê jî dev ji kozikên xwe bermedin, gelê me em bi tenê hêşt jî em wî bi serê xwe nehêlin; berpirsiyariyê xwe yên ronakbîrî û welatperwe-riyê bînin cih.

Baş tê bîra min, sê sal berê gava ku Nûbihar çap bû, min û belkî hinek hevalê din jî texmîn nedikirin û nedipan ku dê ev weşan bi salan jiyana xwe bidomîne. Hêvi-ya me hebû, lê hêvî qels bû; çimkî ji ber tada û sedemên pirralî gelek kêsên ku di nivê rê de mabûn hebûn. İcar iro ez bi këfxweşî û serbilindî di-binim ku Nûbihar sê salên xwe temam dike; ew zarûkek Kurdî ya sê salî ye û iro di himbêza me tevan de ye. Şikir êdî ji pêşîra dê azad bûye, mezin e; çavê wê li dilovanî û alîkariya me ye. Em hemû dikarin jê re bi-bin alîkar. Erê Nûbihar zarûkek sê salî ye lê qîrn û koka wê kûr û dûr e; di-gîhije hezar salan; rehêن wê di bin çiayên Kurdistanê de ne; bi destê Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî hatine avdan. Nûbihar kûlîlkek rengîn a bihara welatê me ye. Ma Seydayê Xanî çiqas xweş gotiye:

*"Di fesla Nûbiharê de
Di gel dîlber biçin geşte
Ji ew xweştir emir nabit
Bi min ew hal qewî xweş té."*

Ez hêvidar im û bîr û baweriya min êdî bi teva-hî pê heye ku ewê Nûbi-

har ji niha pê ve jî weşana xwe bidomîne; roj bi roj bêtir xwe tekûz bike. Helwest û he-wildana xebatkarê Nûbiharê vê hêviya min xurt di-ke. Tiştekî din jî, di rûpelên gelek weşanan de tê nivîsin ku xwedênegiravî ew ji çap-kirina nivîs û dîtinê cihê re amade ne; ez bi serbilandî dikarim bibêjim ku Nûbihar di vê yekê de li ser sozê xwe ye.

Bi hêviya ku gulên welatê me pirrtir û geşir bibin em li Nûbiharê xwedî derkevin. Ez ji dil û can sêsalîya Nûbiharê pîroz dikim, ji bo Nûbiharê jiyaneke dirêj hêvî dikim û serkeftina wê dixwazim.

•••

■ Naci Gülmез:

Dî sêsalîya Nûbiharê de ji jiyana çapemeniya kova-ra hêja re serkeftin, ji xebat-kar û xwendevanê Nûbiharê re selam dikim, fedakaryê dixwazim.

Sebebê herî girîng ê der-keftina kovara Nûbiharê, bi qelema hozanê hêja kek Sabah Kara di pêşgotina hêjma-ra yekemîn a Nûbiharê de

wek wuha hatiye ziman: "Dij-minê me zâlim û bes!" Yanê li dijî her zilmê alaya dijmi-natyê wergirtiye Nûbihar. Di hêla zilmê de jî a herî girîng ew e ku zimanê merîv bête qedexekirin û insan kerr û lal bête hiştin. Di wê xalikê de şîretekî Şêx Selahaddin Efendî (kurê Şêx Seîd Efendî) li Kurdêñ ku koçî roava dikirin wuha bû: "Madem hûn bar dikin, bila zarokên we zimanê xwe yê kurdî jibîr nekin. De-ma zimanê xwe jibîr bikin, ewê her tişte xwe yên netewî jibîr bikin." Gelê kurd di vê rewşê de bû û rewşehbîrên kurd ên çep, nexweşîya kur-dan baş teşxis kirin lêbelê ca-reseriye de xeletiyê mezin kirin. Belê Nûbihar ev xalik dit û bi awayekî islamî, mîs-yona Ehmedê Xanî da ser milê xwe û Nûbara Piçûkan bû Nûbihara gelê kurd.


Bi kurtasî dikarim bibêjim ku di sê salan de Nûbiharê çi kir û pêwîst e ci bike?

Hetanî iro ci kiriye:

1- Hêla îdeolojiyê de: Fikrîn islamî bi heqpârêzya gelê kurd re zewicand û jê neslekî kurd ê nû da his-yarkirin.

2- Hêla edebiyatê de: Prensîba "Hewce ye edîb biedeb bin." ji xwê re ki-riye rîber û bi zimanekî tê famkirin ve di hizûra gelê kurd de ye.

3- Hêla siyâsî de: Tabuya ku misliمانen kurd têkîli dogişa kurdî nabin, hilşand û diyar kîr ku ji berê ve hetanî iro misli-manen kurd li ser sitandîna azadî û mafîn kur-dan tim û tim li pêş bûne. Di navbera misliمان û çepen kurd de pira dayîn û sitandîna fikrê damez-rand û wan nêzîkî hevdu anî. Di dîroka 16.05.1993ê de bi sempozyuma "Pir-sa kurdî çawa çareser di-be?" ji dijminen kûrda re



32. Serokê Karên Diyanetê
nizane ku ci dibêje

FEBRUS 32 • OCAK 1995 • 40.000 TL

îsbat kir ku, em jî hene û em li dijî zilma Kemalîstan a li ser kurda ne û em li vê zilma wê lanet dikan.

4- Hêla çapemeniyê de: Ha ji aliyê xebatên kovara Nûbihar ve, ha ji aliyê kitêbên ku di weşanxana Nûbiharê de têne belavkirin, wek "Şirnak Baskını" ve hundirên Kemalîstan û dijminên kurda berovacî kir û ruçikên wan ê esasî derxist holê û wek bi çapkırına Rîsale'ê Nûr ên bi kurdî, nezera Kurdan da bi aliyê çavkaniya kurda:

Çend gotinêni bi biratî:

1- Di hejmarê Nûbiharê ên paşerojê de, divê zêdetir li ser dermanê tirsê, bêhêviyê, hezkirina meqam û wek nexweşiyê din bisekine û Nûbihar wezîfa eczaxanekê bide ser milê xwe.

2- Derya welatparêzyê ji xorêtê kurd re veke û şertê ketina hundirê wê deryayê ji ev bin:

- a- Rastî. b- Terka sefahetê.
- c- Baweriya yekitiya Xwedê.
- d- Yekitiya qelb. e- Yekitiya fikir.

Ji ber ku yekitiya me bi van pênc xalikan ve ewê zûtir bibe. Ji ber ku ev xalika wê yekitiyê bidin fikra me û istiqametê jî bide jiyana me.

...

□ M. Latif Salihoglu:

Mirov dikare bibêje Nûbihara ku bi zimanê kurdî weşanê dike, kovarek e ku pirseke bi salan, hetta bi esran îhmal bûye, daye ser milê xwe û kovareke bêtawîz e ku huwiyyeta dewayeke bi gelek rîşkan mxatab bûye, qezenc kiriye.

Daweya ku esil tawîz nedaye, dîn e, îman e... Di hemî mijarênu ku şixulan-diye de çîrûskên vê kaniya qudsî hene.

Bi xwe spartina Qur-

anê ve, tewra ku di sefa mezlûman de, li hember zulmê û zaliman girtiye de bêtawîz e, dijwarî ye. Di nav vî tawrê bi rûmet de xwe goriya vejan-dina ziman, edebiyat, çand û medeniyeta kurdî kiriye; hem jî bi şiklekî ku ji nîşana zaafiyet û gumanê dûr e.

Nûbihar di saha û weşana xwe de -çi heyf e ku- bi te-nê ye. Xwezî mîna wê hine-kên din hebûna û bêhtir di yelpazeke fireh de belav bû-bûna. Feqet ji ber ku di terefê me de ev tenê heye, lazim e em bi heqî lê xwedî derkevin.

Ez wisa difikirim ku kesê ewladê kurdan be, lê li qiy-metek mîna Nûbiharê ku wa-sita xizmetê ye, xwedî der-nekeve, pê alaqedar nebe, yan jî ji bo jiyana xwe bidomîne ti-tîstî neke, ew ya hîsa wî ya hamiyetê zeff bûne, yan jî ji xelkê xwe re bê hîs e.

Divê em vê yekî bi qet'î bizanibin ku, miletek din li ziman û edebiyat, li çand û medeniyeta miletekî xwedî dernakeve; hem ne şert e ku xwedî derkeve jî... Meselen em bibêjin ku li Efrîkaya Ba-

şûr pirsa xelkekî mîna ziman, edebiyat û çandî heye. Ev, he-ta kûderê me elaqedar dike? Beriya her tiştî lazim e ew mi-let bi xwe li mesela xwe xwe-dî derkeve. Lêbelê, berpeyiya ku emê li hember ehlî kufr û ehlî zulma ku li eynî cihî yan jî li diyarke din dibe nîşan bi-din, helbet wê bi awayeke din bibe.

Bi vê qiyasê manaya ku em qest dikan, me bi du cur awayan ku yek xusûsî, yek jî gelemeperiya rûbirû tîne.


Di Nûbiharê de bi piranî nivîsên ku bi giranî min eci-bandin derketin. Ji ber ku bi besî em lê xwedî derneketin, ne Nûbiharê, lê divê em vê bêelaqedariya xwe rexne bîkin. Lê hema ji ber ku we heqê rexneyê da me, emê vê jî ifade bikin: Em dixwazin ku Nûbihar bala xwendevanan nekşîne ser siyaseta bi şâibe, bi netamet û fanî. Lazim e ni-vîsên bi giranî siyâsî ne, tê de cîh negrin. Bila balê nekşîne ser bûyerên ku zerarê bidin ûmaja wê û ji meqseda wê re bibin perde. Lizûmiya we ji bo wê wetê dibe ku hebe, lêbelê li gor min, bi bu-hurîna zeman, dê sethîtiya ev cur meselan derkeve holê, û ez bawer dikim wê bibin sebebê gen-geşiyê bêsebeb jî. Eger hûn van ifadeyên min yên wek endîşekê li ser hejmara Nûbiharê ya 17an (Reyên xwe nedîn dizên çep û rastan), zêde bimubalexe bibînin, wê wextê mîna temeniyeke qebûl bikim.

Xwedê Teala cehda we zêde bike û di xizmetên ku hun bi niyeteke safî dikan de, kuwet û hêsanîyê bide we.

...

□ Abdullah Xerîb:

Merheba gelî xwendevanê Nûbiharê, ji



34-35. Rapora "Pirsgirêka Rojhîlat" a TOBB: Şîr û şîr tevlîhev

diyarê dilbirîn û dil bi xem ji xwendevanê Nûbiharê re merheba...

Silav ji bo muslimanê dinyayê. Silav ji bo xelkê mezlûm û bindest... Silav ji bo mustezef û mahruman. Silav ji bo bêkes û belengaza... Dîsa merheba xwendevanê Nûbiharê; merheba Nûbihar...

Belê Xuda welatekî pir xweş û rind xistiye bin piyê me. Lê belê dilê me nerehet e... Dilê me bi kul û xem e. Lewra dayikê me dilbirîn û belngaz in. Çavê xuşkê me ji sitérka xalî nabin...

Eceba şîn para wan, kîf û xwesî ji para hinkî dina ye?...

Geli birayê xwendevan, li goriya tarîxa mîladî em qirnê bîsta xilas dikin, lê pir meetteessuf li Şerqa Nîvî de xûn û şîn heye... Birayê musliman, bi birayê musliman didine kuştin...

Aceba çîma musliman li Şerqa Nîvî de ketine ber pêsi-ra hevûdu û kîfa neyar û dij-minê xwe tînin.

Şerqa Nîvî tarîxa derbaz-buy de ji herdem li ber çavê emperyalitê dunyê bû. Zalim û xunmij ji berê va dixwestin ku li Şerqa Nîvî de bibin hakim. Weqta Osmanî zeif bû, ji çar aliya ve hate işxalkirin û hate paykirin. Lê belê musliman, li hemberê zalima serî rakiribûn. Bi can û malê xwe li hemberê emperyalistên dinyayê de şer kirin. Heta kû van zalima ji welatê xwe ajotin. Weqta ku zalim ji Şerqa Nîvî bi zorê hatin avêtin, ewan fam kir ku bi zor û zordestiyê nikarin hakimê van welatan bin, wê çaxê rabûn bi takîkin nû hatine gelê musliman.

Xwendevanê ezîz; takîka zalima ev e: Berê bi zor û zordestî dihatin Şerqa Nîvî. Xelk dizanibû ku vaye zalim û xunmij girtine ser welat. Radikirne tiving û rexta, canê xwe didan, lê zalima ji welat

diavêtin. Takîka iro de sîste-ma gayrî-îslamî hakim kirine ser welatê muslimana. Weke wan difikirin, weke wan di-jîn, hatine bûne hakimê muslimana. Sebebê her tiştî gerrek em li vir bibînin...

Me li jorê got, merheba Nûbihar. Nûbihar mîzgîna bihareke xweş; Nûbihar, hoşamediyek çaxekî baş e... Loma dibêjim, merheba Nûbihar...

Nûbihara nû da wê xelkê Şerqa Nîvî şîyar bin. Wê dij-min û neyara baş nasbikin.

Seydayê mezin Bedîuzzaman bêsebeb ne gotiye, "Min lezki, ez di zivistanê de hatim." Ev mîzgîna wî înşellah wê derkeve û wê nûbiharek bi ser gelê Şerqa Nîvî de werê...

Musulmanê şerq û xerbê gerek tev şîyar bin. Li şerqê weqta ku stiriye bikeve piyê muslimanekî, gerek muslimanê li xerbê elem bibînin û pê bişewitin. Lewra muslimantî wiha emir dike. Dînê îslamî wiha dibêje...

Iro em lê dinêrin li şaxekî welat xûn û kuştin û talan heye, li şaxekî welat jî kîf û xwesî. Ma musliman kengê ji vî halî wê şerm û heye bikin?

Li hemberê van nexwesiyyîn han de ji em bêumêd nîn in. Baweriya me heye ku wê nûbiharek werê.

Bi vê baweriyyê em dijîn. Ev cerîda ha (kovar) ku navê Nûbiharê standiye, mîzgîn dide ku bihareke xweş wê werê. Loma em dîsa dibêjin, merheba Nûbihar!

Bo sêsalîya Nûbihar

CANKURD

Mîna guleka Nesrînê

li kenarê gola xwînê

Mîna çîrayeka şevreşiyê
di tariya koletiyê,

li kuncekê zîndanê

Mîna hozanvanekî dildar
di nav êlén hevneyar...

Mîna destpêka biharê,
û vebûna gupikên hinare,
li ciyayê Cûdî û Gabar

Mezin dibe ev kovar...
bilind dibe navê Nûbihar

Mîna dilê min i tîjî xem,
dîlivlive Nûbihar,
dixumxume ev çem,
dibe lehî...

li her derekê, li her dem..

Mîna evîna Ehmedê Xanî
ji goristana Turanî...
bi xwe re camek ava kewserê
ji Cizîra Botan anî

Mîna dengê Şivanî,
ji xew rakir kela Mêrdinê
Kermanşah û Mihabad
Efrîna malwêran ta Suleymani...

Mîna dilê min i tîjî kul,
Nûbihar bûye nexşeya welat,
bûye xebat...

Nuqurç

MËLA QASIM

54.

Dibêjin cesareta li hember zilmê xweş e
Erê lê cesareta ku digel ilmê xweş e
Ma tu nabînî ehmeq jî pir caran cesûr in
Û cewaba ehmeqan carna bi kulmê xweş e

55.

Ehmeq terfi kirine hin jî bûne nivîskar
Li her derê pir in lê di nav me de ya sitar
Tu l'afre û tafra wan dînhîrî kenê te tê
Ku l'ber zordaran seg in lê li ber me gurê har

56.

Ehmeqekî nivîskar qaşo ji yên reformîst
Ji hin rewşenbîrên kurd re gotiye şovenîst
E'zanim ku eqlê vî nivîskarî bostek e
Lêbelê zimanê wî ne deh bost e û ne bîst

57.

Îro min kerekî dît mast bi metro dikirî
Kirîdarê eql jî bû eql bi kîlo dikirî
Ji min pirsî kîloya eqlê te bi ci ye lo
Min go bi kîlo nadim ma tu b'metro dikirî

58.

Kero ez axînek xwe b'sed ox oxê te nadim
Bîzan xizaniya xwe b'milk û malê te nadim
Te xwe firot tu nîn i bedla li te vala ye
Zencîra li piyê xwe b'sed hefsarê te nadim

Dubeytî

BABA TAHİRÊ URYAN

Ji lorî: SABAH KARA

146.

Dilêm teng e nizanim sebirkirin
Ji diltengî bûme razî bi mirin
Ji fedya ruwê te ez bi hicab im
Nizanim erzihalim bi te kirin

147.

Ê ku bê xan û bê man e ez im ez
Ê ku bereksê saman e ez im ez
Ê ku şevan tev bi nalîn dike roj
Ê rojê wî wek şevan e ez im ez

148.

Poşiman im poşiman im poşiman
Em dimeşin vê riyê de wek karwan
Kevindinya ji kesî re nemaye
Barê xwe dikşîne herkes bi milan

149.

Ez ew bazê sipî me b'sînesojî
Cihê min in ew çiyayên bê serî
Hemû şûrê xwe bi hesan tûj dikin
Ez ew şûr im Xweda'z kirme hesanî

150.

Eger wek Yûsif min bibin bi zîndan
Yan ger binalim ji xem wek perîşan
Ger sed baxvan dijminî l'min bikin jî
Ezê her tim bêm gulzara te b'kenan

151.

Newaya nalînê nalînvan zane
Eyara dilê safî canan zane
Werin sotîdila'm pev re binalin
Sotîdil qedrê sotîdilan zane

152.

Dilê min nizane ku sihhet çi ye
Ez dikim nizane nesîhet çi ye
Ez didim ber bayê ba ewî nabe
Davêm agir nabêje şewat çi ye

153.

Ew nesîmê ku ji wan keziyan tê
Bi min xweşîr ji bêhna sinbilan tê
Dema bi şev xeyalêt hemêz dikim
Sibê ji nivînan bêhna gulan tê

154.

Serêm heye ku hêlîna wî nîn e
Xemêm heye ku dawiya wî nîn e
Eger tu bawer nakî were cem min
Bibîn derdê ku dermanê wî nîn e

155.

Dilêm heye demkê jî xurrem nabe
Xemêm heye ku ti carî kêm nabe
Qederam heye ji rindê alemê
Ku yara bêwefa hevderdêm nabe

Mesnewî / 14

MEWLANA CELEALEDİNÊ ROMÎ

Ji farisi: SABAH KARA

Beyana duwazdeh qism ji nesara

Qewmê ïsa re hebû b'hukm û tedbîr
Mîr û hakimê wan duwazdeh emîr
Her firqeyek ji mîrekî re teba'

- 1/460 Bibûn bende j'mîrê xwe re ji temâ'
Ev duwazdeh emîr bi qewmê xwe re
Bibûn bende j'wezîre bedbexte re
Îtîmada tevan bi gotinê wî
Iqtîdaya tevan bi kîrinê wî
Her weqt û saet her emîr li ber wî
Can dida ger bigota ku bimir wî

Tevlihevkirina wezîr ehkamê Încîlê

Çêkir tomarek bi navê her yekî
Neqşa her tomarkê dîger meslekî
Hukmên her yek ji wan bi cûrek dîger
Ev xîlafê wê ji piyan ta bi ser

- 1/465 Yekê de riya riyazet û cû'ê
Kirbû riknê tewbê'w şertê ricû'ê
Yekê de gotibû riyazet ci ye
Vê riye de felat bi camêrtî ye
Yekê de gotibû cû' û cûdê te
Şirk e ji te li hember me'bûdê te
Jibil tewekkul û teslîma temam
Di xem û rehetê de tev daf û dam
Yekê de gotibû wacib xidmet e
Ger na fikra tewekkulê tohmet e

- 1/470 Yekê de gotibû tev emr û nehî
Ne bo kîrinê bo şerha acizî
Da ku em ecza xwe bibînin bi wan
Qudreta Heq pê bizanin ew zeman
Yekê de gotibû ecza xwe nebîn
Kufra ni'met dike kesê eczebîn
Qudreta xwe bibîn ku ew ji Wî ye
Wî daye te ku qudret navê Wî ye
Yekê de gotibû dev ji van berde
Tu ci bivî ew dibe bût li ber te
- 1/475 Yekê de gotibû nemrîn vê mûmê
Ku ev dîtin mûm e li ber umûmê
Ger tu ji nezer û xeyal bibhûrî
Tu mûma wîsalê bi şev dikûjî
Yekê de gotibû metirs bikuje

Ev ê hezaran li hember vê bide
Ku j'kuştina mûmê can efzûn dibe
Ji sebra te Leyla te Mecnûn dibe
Terka dunyê her kî bike j'zuhda xwe
Dunya pêşdetir tê ber wî xwe bi xwe

- 1/480 Yekê de gotibû tiştê da te Heq
Wê şérîn kiriye çavê te de Heq
Ber te hêsan kirye û xweş wê bigir
Xwe bi destê xwe navêje nav agir
Yekê de gotibû berde ya ji xwe
Ku qebûla teb'a te redd e bi xwe
Riyêncurecureyî hêsan bûne
Her yekê re milletek wek can bûne
Eger hêsankirina Heq çare bû
Her cihûd û mecûs Pê bawer dibû

- 1/485 Di yekê de gotibû hêsan ew e
Ku jiyana dil û qâtê can bibe
Her ci l'gor zewqê be dema ku diçe
Wek bizrê erda hişk bêber pûç dibe
Ji bil poşmanî tişt nîn e dawuya wî
Ji bil xisarê tişt nayne bey'a wî
Ew qe hêsan nabe di netîcê de
Ew dibe zehmetî di dawiyê de
Zehmet û hêsanê ji hev ferq bike
Li dawiya herduwan mîze bike

- 1/490 Yekê de gotibû ustâd biteleb
Ti netîce nîne ji esl û neseb
Aqîbet dîtin her cure milletan
Bêguman ew ketin nava zilletan
Dîtina aqîbetê bi dest nîn e
Ger wisa ba dîn nedibûn ev cure
Yekê de gotibû ustâd jî tu yî
Lewra tu yî ku tu ustâd nesdikî
Mêr be û mesquerayê mîran nebe
Li çara xwe binêr sergerdan nebe

- 1/495 Yekê de gotibû ev hemû yek in
Kesê wan dido dibînin şâşek in
Yekê de gotibû ma sed yek dibe
Meger ku dîwane idia bike
Her yek ji wan peyvek in ziddê hev in
Ger yek ji wan şekir be jehr e a din
Heta ku tu j'jehr û şekir nebhûrî
Ma tu karti yekitiyê bêhn bikî
Ew dijminê dînê ïsa b'vî şiklî
Duwazdeh defter hazır kîrin tijî

Şêx û mirin

NURETTİN DURMAN

Ji tîrkî: HOZAN OFLAZ

Hûn li nav du zabîtan rûniştî ne
bi cilên sipî
û şâşikek li serê we yê sipî ye
piştika we fireh û muhtemelen reş e.
Fotosûreta we hatibû girtin Şêxim. Quddûm nebû.
Buhurîbû qeydê, zebtên mehkemê
û rûpelên zer ê tarîxê.

Li nav Diyarbekir û Çeqaxçûrê
û bi aliyê Elazîzê de mîna nîdayekê
hûn digeriyan. Hê jî
hûn fireh dibûn
we xwe li çiyan dida.
Mîna eyloyekî bi bal û per
ku dakeve ji bilindiyan
bi nihêrtineka mutteqî li aso
di destpêka şewitîna dil
herikîna xwînê
û sekinîna neböz de. Şêxim
çawa bû derketina tavê?. Danê sibê?
Êvarê? Nimêja teheccûdê?.

We bi rizaya Barî berdabû
nefesa xwe ya mubarek li bajêr. E'zanim.
Awirê we mulayîm
dilovan û însanî bûn.
Dilê we gulistaneka muhtesem.

Nexwe li dara idamê jî Şêxim
Dikare sipehî be mirin.
Li nav Diyarbekir û Çeqaxçûrê
û bi aliyê Elazîzê de mîna nîdayekê.

Helwest

Kovara çand û edebiyata kurdi "Helwest" ji Swede da der. Di vê hejmara
we ya ewil de ev nivîs cih girtine:

- Helwesta Rexnegiriyê
- Rexneyen Edebi û Valahiya Rexnegi-
riyê - Lokman POLAT
- Huner û Pêvajoya Nû - N. ZAXURANI

- Post-modernîzm - Burhan GUNEL
- Himdarê Edebiyata Kurdi Ehmedê
Xanî - M. YILMAZ
- Ziman û Ziimanê Kurdi Sipan - Me-
denî PERHO
- Nivîskarî û Berpirsiyari - Z. SÈXMÜS
- Ji bo Nameyên Xwendevanî
- Xelata Kurteçiroka Kurdi
Navníşana xwestlinê: Tensta Ale 43-
2tr. 16364 Spanga/Sweden

Zarokname / 2

XELİL AMED

Secdekirina xanê

Xoce rojekê dixwaze biçe gun-dekî. Di rê de diweste. Wext şev e. Dibêje: "Ez işev biçim li xanevê bimînim." Li ser rê xanek dibîne û diçe xanê. Derbasî oda xwe dibe. Lê çi mixabin ji dengê tex-teyên xana kevin, tu xew nakeve çavên wî. Ji ber vê, zora Xoce de-re, dadikeve jêr, ji xwedyê xanê re dibêje:

- Qurban ev xana te pir kevn e. Ez ditirsim ew bi ser me de bikeve."

Xwedyê xanê dibêje:

- Xoce, ma tuzanî her tişt bi zi-manê xwe Xwedê zikir dike. Ji ber vê, xana me jî bi şev zikir dike.

Xoce bi ken dibêje:

- Kuro, ez ditirsim ewê gavek din xana te bi eşq û şewqekê biçe secdê û emê jî di bin de bipelixin.

Rengîn û Xemgîn

Rengîn: Birayê Xemgîn, çîma madê te ne li te ye?

Xemgîn: Nepirse bira, nepirse!

Rengîn: Çîma lo, ma tofan li te qewimî?

Xemgîn: Na, bira! Qehra bavê min li min qewimî.

Rengîn: Ji ber çî?

Xemgîn: Min dixwest ez mîxekî bikutim dîwar. Dema min mîx kuta, çakûç li destê min ket.

Rengîn: Birayê ezîz! Ma çakûç di destê te de ye, ne bes e? Ma mîx di destê de de çî dikir? Te bida-na destê yekî.

Xemgîn: Temam keko! Cara du-yemîn, min mîx da destê bavê xwe.

Rengîn: Èêêê?

Xemgîn: Îcar çakûç li destê bavê min ket û pirr êşîya. Ji ber vê, qehra bavê min li min qewimî. Ayyy pir dêşel!..

Rengîn: !!!!?

Mêraniya gêrik

Rojek ji rojan, gêrik û devlok (fil) bi hevdu re dibin heval. Hevaltiya wan pirr xweş dimeşe. Rojekê gêrik serî di ber de, difikire û bi rê de diçe. Hew carkê mêze dike devlok tepên xwe yê wek tepê devehê ra kiriye û bi pozbilindî li ser gêrik sekiniye. Dema gêrik vê rewşê dibîne, ji devlok re dibêje:

- Heval ma ka bêje, ev ci hal e? Ma tu dixwazî min bipelçiğinî?

Tu nabê hovîtiya devlok dest pê kiriye. Devlok jî dibêje:

- De were li tirsekî ha mîzene. Ma em kengî bû-ne hevalê hev? Zû ji ber ri-ya min rabe! Yan na, ezê te wek kaxezê bipelixînim.

Devlok bi qehîrîn tepên xwe wek birûskî li erdê dixe û dibêje:

- Heta niha tu kes ji van tepên min xelas nebûye.

Ji ber vê, ûr û pizûrê gêrik derketiye. Devlok dix-waze laşê gêrik bibîne û xwarê erdê dibe. Mêze dike ku tişték nexuyaye, ne gêrik û ne laşê wî.

Gêrik xwe dixe bin ke-virkî û xwe xelas dike. De-ma devlok xwehr dike, gêrik ji bin kevir derdi keve û êrişê pozê devlok dike û pozê wî geza gêrik, devlok ji êşê dîn û har dibe, li erdê dirêj dibe û digevize.

Dema yên derdor vê bû-yerê dibînin û dawiya halê

devlok dibînion, bi zûkahî dûrbîstok (telefon)ê vedi-kin nexweşxanê û ba am-bulansê dîkin.

Ambulans tê, devlok bi ecele lê dîkin, pozê devlok girêdidin, ta ku bila xwîn pirr jê neherike û ambulans bi rê dîkeve.

Dûv vî şerî, ji ber ku xwî-na devlok li erdê dibîne, gêrik pirr xemgîn dibe. Ji xwe re dibêje:

- Ma ev ci hal e lo! Min rabû nehaqî li hevalê xwe kir û min ev halê nebaş anî serê wî.

Dûv vê, gêrik bi lez û bez bi revek çargavîn dide dûv ambulansê.

Yên ku îcar lez û beza gêrik dibînin, jê dipirsin:

- Ma malmîrato, ne bes e te ewqas bûyer anî serê devlok? Ma hin tu dixwazî devlok bikujî, ci ye?

Gêrik jî dibêje:

- Na hevalno, na! Ez dixwazim berî ambulansê bigihêjim nexweşxanê.

Yên derdor bi heyret û ecêbmayî jê dipirsin:

- Kuro ji ber çî?

Gêrik wiha bersivê di-de:

- Hevalno! Ez ditirsim hevalê min bimire. Ez dibêm belkî ji hevale min re xwîn lazim bibe. Ji bo ku nemre, ezê xwîna xwe bi-dimê.

Derdor ecêbmayî dimî-nin. Heta heta, ez û mala me jî em pirr ecêbmayî man.

Şêr û kerguh

Ji BEYDABA

Daristanek hebû, pirr xweş bû. Yêñ têde dijîn, pirr çavxweş û dilgeş bûn. Lë çi mixbin li wir şerekî dijwar dijya. Ji tirsâ wî, heywanan tu car nedîwêrîn ku bihatana vê daristanê. Nikarîbûn giya bixun û ava xwe vexun. Heywanan ji vê rewşê pirr xemîn diman.

Rojekî dixwazin biçin cem şêr, da ku bila şêr vê zordes-tî û neheqiyê ji ser wan rake. Ji bo vê, ji şêr re dibêjin:

— Şahê me, em ji tirsâ te, ji vê darsitanâ xweş ne dikarin bixwin û ne ji dikarin vexwin. Em dixwazin tu îznê bidî em werin vê daristanê û li warê xwe bijîn; li hember vê, emê her roj ji xwe yekî ji bo xwarinê bidin te.

Şêr daxwaza civata heywanan qebûl dike. Heywana ji, her roj ji bo xwarinê hevaled xwe dibin didin destê şêr.

Di vê bûyerê de gelek roj û gelek hevalê wan diçin. Paşedor tê kerguh. Kerguh naxwaze di bin lepê şêr de bimre. Ji ber vê, dixwest ji destê şêr xelas bibe. Loma hemû heywana li derekî berhev dike û ji hevalên xwe re dibêje:

— Hevalno! Heger hûn guh bidin min, ezê we ji vî şêrê devbixwîn û zordar xelas bikim.

Hevalên wî jê dipirsin:

— Bi çi awayî tê me xelas bikî?

Kerguh dibêje:

— Pirr û pirr rehet e.

Hevalen wî guh didinê.

Dibe sibeh, dema kerguh tê. Kerguh dixwaze hinek dereng biçe cem şêr. Loma di rê de dest bi leyz û lîstikê dike. Ji ber vê, gelek dereng dighe cem şêr. Şêr pirr bi xeyd ji kerguh dipirse:

— Hey kerguhê tirsonek! Tu çima wer dereng mayî? Tu li kû mayî? Haydê ji min re bêje!

Kerguh bi tirs bersiv dide:

— Şahê mel! Dema min ji bo te kerguh dianî, di daristanê de şerek din derket pêşya me û ji min pîrsî:

— Hey kerguh! Hûn diçin kûderê?

Min bersiva wî da:

— Ezê vî kerguhî bibim cem şahê me.

Şêr bi qîrîn ji min re got:

— Li min mîzeke kerguh! Here ji wî şahê xwe yî tirek re

bêje, “Ji vir û şûnve şahê vê daristanê ez im.” Û dawiyê kerguh ji dest min girt û xwar.

Şahê daristanê ji vî halî pirr diqehire; ji guhê kerguh digre û dibêje:

— Kerguh! Kerguh! De ji min re bêje ew şêrê genî yê ku li hember şahiya min derketiye, ka li kû ye. Bide pêşıya min û min bibe cem wî. Ezê ûr û pizûrê wî derxînim.

Kerguh şahê daristanê digre û dibe ser bîrekê. Ev bîr, gelekî kûr bû. Şah serê xwe dirêjî devê bîrê dike, hew mîze dike ku di bîrê de şerekî din heye. Şêr bi awazek bîlind dibêje:

— Ey şêrê tirall! Nereve, vaye ez têm! Tuê bibînî ka şahê vê daristanê kî ye!

Şêr bi lez xwe davêje bîrê. Lë nizane ku di bîrê de tu şer tune. Şêrê di bîrê de, siya wî bi xwe bû.

Piştî ketina şêr hindek deng û awazê wî derdikeve, lê dawiyê deng jê diçê.

Belê, şêr di bîrê de dixenique. Bi mirina şêr, dîsa li daristanê şahî û kîfxweşî çedîbe. Ji vir û şûnve kerguh dibe şahê daristanê û jiyanâ wan pirr xweş derbas dibe.

Yezdanê Mîhrîban jiyanek bi azadî û dilxweşî bike nesîbê me ji! Amîn!





Agir û şeytan

Rojejk du mirovén genî û pejmurde têñ cem Xocê Meşhûr. Ev mirov, bêol û bawerî bûn. Dixwazin Xoce bikin tengasiyê. Ji ber vê, ji wî dîrsin:

— Xocê binavûdeng! Emê ji te du pirsan bikin. Em dixwazin tu bersiva wan bidî.

Xoce dibêje:

— Fermo!

Ji bo ya yekem dibêjin:

— Xwedê ewê şeytan bi çi awayî di dojehê de bişewitîne? Ma agir hîç agir dişewitîne?

Ji bo ya duyem jî dibêjin:

— Baweriya me bi Xwedê tune. Em dibêjin Xwedê tune; ji be ku em wî nabînin.

Xoce bi ken perçek derem ji erdê digre û li serê herduya dixe. Mirovén bêbawer bi êş û xwînê diçin cem qadî û halê xwe jê re dibêjin. Qadî gazî Xoce dike û tînê dîwanê.

Qadî ji Xoce dipirse:

— Xoce ji me re bêje te çima we kir?

Xoce bi ken bersiv dide:

— Qadî, evana hatin cem min, ji min pirsîn, gotin: "Xwedê ewê çawa şeytan di dojehê de bişewitîne? Ya diyemîn ji min dîsa pirsîn "Em Xwedê nabînin, ji ber vê, Xwedê tune." Loma min jî ji

erdê perçek derem girt û li serê wan xist.

Qadî:

— Èéêê Xoce, ci alaqa van bi hev re heye?

Xoce:

— Wan got: "Agir naşewi-



tîne." Min jî got ku dişewitîne. Çawa insan ji axê hatiye afirandin, lê ax axê dişîne. Ew jî ji axê ne, ax jî ji wan e, çima dişîne? Heger ax axê

dişîne, wê çaxê Yezdan jî dikare şeytan di nav agir de bişewitîne.

Ji wan mirovén bêbawer yekî dest bi qîrînê dike:

— Ay, ay, ay; way, way way!..

Xoce diçe cem û jê re dibêje:

— Ma serê te naêse?

— Diêse.

— Na, naêse.

Xoce û mirov li ser "diêse û naêse" bihev dikevin.

Mirov dîsa dibêje:

— Diêse.

— Heger diêse, rayê min bide.

— Ez nikarim rayê te bîdim.

Xoce:

— Çîma tu dibêjî diêse û tu nikarî êşê rayê min bidî.

Mirov:

— Eşa min heye, lê ez nikarim rayê te bîdim.

Xoce bi kêt dibêje:

— Lo geniyo! Ez jî dibêjim, "Xwedê heye." lê ez nikarim rayê te bîdim.

Li ser vê bersivê, herdu mirov tobe dikin û dîbin misliman. Qadî jî di heyretê de dimêne.

Gotinê pêsiyan

- Şêr şêr e, ci jin e ci mér e.
- Kurmê darê ne ji darê be dar narize.
- Giya di bin kevir de namîne.

Dîwan / 4

SEYID ELIYÊ FINDIKÎ

Ji tîpêñ erebî: BABÊ HACER BÊRÎVAN

*Eli palde were rayê
Bişo xwe j'ehlê dunyayê
Gelo ma qet te bîr nayê
Nedît te j'wan ji xeyr sarî*

*Eger zahir de ew dost in
Di batin de tenê post in
Hemî yek kîş û yek bost in
Ji wan dûr be bi hişyarî*

*Xuda bigre temam berde
Bila l'ber te nebin perde
Nebêj ev qenc e ev merd e
Heye tavik ji dijwarî*

*Bi wê tavê neçe rê da
Tu hişyar be ji vir pê da
De tu nemînî di heyrê da
Te hew dî j'nişka va barî*

*Hezar heyfe ku dostanî
Ne safî bî j'dil û canî
Biye b'hîle'w duezmanî
Me cerbandiye sed carî*

*Me cerbandin gelî j'dostan
Ne şagirtî belî j'hostan
Bi reng bûn wek gulê bostan
Xezam weşhan bi hawarî*

*Divê dost lev bikin sebrê
Şerîk bikin xweşî'w qehrê
Heta ku ew biçin qebrê
Eger ne hîç e ew yarî*

*Belê xasê Xudê mane
Wefadar in ne wek va ne
Bizan Seyda yekî j'wan e
Tu bawer nakî her darî*

*Belê b'sertê tu çeknas bî
Ji borê kînê derbas bî
J'Xudayê xo ra mîrxas bî
Nedî dest nefşê hefsarî*

*Heçî hefsar bidê nefşê
Muheqqeş ew kes ê b'tehsê
Ew ê paşî biçê hebsê
Belê hebsa reş û tarî*

*Nebe teslîm ji nefşê ra
Xwe bişdîne wekî mîra
Bike şerr û qirîn pê ra
Şev û rojê heta karî*

*Heçî mehbûbê Seyda be
Dikim hêvî ku dilşa be
Qiyamet ku li me rabe
Xilas bit ew bi yek carî*

Ji aboneyên me re!

Xwendevanêñ hêja!

Weke ku hûn zanîn, sala me ya sisîyan hi vê hejmarê diqedê.

Emê hûn aboneyên xwe bi agahnamekê ji agahdar bikin. Lê me divê ku hûn ji nîha ve
haziriya xwe bikin û bîhaya abonetiya xwe ya nû ji me re rê bikin.

Kovara we Nûbihar heta îro bi sayeta abonetî û kîfîna we, hebûna xwe domandiye.

Nefikirin ku "Ma eger ez abone nebim dê cîbibe?"

Gellek kovar ji ber ev cûr fikirînan weşana xwe sekinandine.

Eger herkes bifikire û bibêje ku "Ma eger ez abone nebim dê cîbibe?", mumkin nîn e ku
kovara we Nûbihar hebûna xwe bidomîne. Lexwe abonetiya xwe nû bikin!

—Nûbihar—

Pirsname / 5

SELMAN CİHADVAN

Cewabêñ xwe bi remza "Pirsname / 5" bişînîn navnîşana kovara me. Ji nav kesên ku hemû cewabêñ wan rast in, emê bi rêya pişkê bi 10 şexsan, bi her yekî kitêbek ji kitêbêñ Weşanxaneya Nûbiharê diyarî bikin.

1- Rojmaneya pêşin a kurdî *Kurdistan* ji
aliyê kî ve derdihat?

- A- Mîqdad Mîdhet Bedirxan
- B- Celadet Bedirxan
- C- Ebdurrehman Bedirxan
- D- Muhemmed

Mehrî

2- Berpirsiyarê
giştî yê rojnameya
Kurdistan kî bû?

- A- Cemal Baban
- B- Mîqdad Mîd-
het Bedirxan
- C- Siddiq Ebdullah
- D- Ebdurrehman

Bedirxan
3- Ji van zimanen
kîjan nêziktirê zi-
manê kurdî ye?

- A- Tirkî
- B- Erebî
- C- Farisî
- D- İngilîzî

4- Nivîskarê pir-
tûka *Kurdistan Teali*
Cemiyeti kî ye?

- A- İsmail Göldas
- B- Felat Dilgeş
- C- Ahmet Aras

D- Zeynelabidîn Zinar

5- Ev parça helbestê ya kî ye?

Pirsî ji dinê min ev bi hîkmet:

"Mehra te çî?" Gote min ku: "Hîmmet"
Hasîl ku, dinê bi şîr û ihsan
Texsîr dîbit jiboyê însan

A- Feqiyê Teyran

B- Eliyê Herîrî

C- Osman Sebrî

D- Ehmedê Xanî

6- Ji van weşanan kîjan mehane ye?

- A- Armanc
- B- Welatê Me
- C- Roj

D- Ronahî

7- Ji van weşanan
kîjan fesilname ye,
ango her mewsimê
carkê derdikeve?

- A- Govend
- B- Stîrka Rizgarî
- C- Nûdem
- D- Welatê Me

8- Kîjan herêm
navenda Rojhilata
Navîn e?

A- Kurdistan

B- İraq

C- İran

D- Sûri

9- Ji van hevokan
kîjan ne rast e?

A- Tu jîrî.

B- Ew Aram e.

C- Hûn çawa ne.

D- Em baş in.

10- Ev helbest a
kî ye?

Mirina zilma xedar bizan yara min tu yî

Hey hêviya wê rojê ku debara min tu yî

Xwezi mirin nebûna heta mirina zilmê

Şeva mirina zilmê, şev-erûsa min tu yî

A- Cankurd

B- Xeyyam

C- Mela Qasim

D- Baba Tahirê Uryan



Bersivêñ Pirsname / 4

1- (A) 2- (D) 3- (A) 4- (C) 5- (B) 6- (D) 7- (A) 8- (C) 9- (B) 10- (B)

Naveroka

sala sêyemîn

Îmzayên li jêr, navê kesên ku sala sêyemîn de di Nûbiharê de nivîsê wan weşiyane nişan didin. Îmza li gor tertîba paşnavan hatine rézkirin. Jimareyên di nava parantêzê de; yên ewil, hejmar; yên din, rûpel in.

ACAR Hayrullah

- "Dilê min li welatê min veşérin" (26/7)
- Azadî û idareya adil (ji Bediuzzeman Seîdê Norsî) (32/6)
- Lépirsîn (34-35/3)

AKAR Hüseyin

- Tenyayış mergo (27/29)

AKIN Gültén

- Strana kesê ku li xaniyê bilind rûdine (33/21)
- Gotina dawî (33/21)

AKTÜRK Süleyman

- Lépirsîn (36/7)

ALAN Memê

- Çend gotin li ser nivîsara û Cûlemêrgî ya di "Welatê Me" de (33/22)
- Lépirsîn (36/4)

ALÎ Muhammed

- Lépirsîn (34-35/9)

ALPAYDIN Ahmet

- Elî rabe (ji Seyid Eliyê Findikî) (28/29)

ALTAN Ahmet

- Atakurd (31/26)

ALUÇ Mehmet Ali

- Biçibîn biçibîn û bistîn (ji Nurettin Durman) (29/15)

AMED Abdillah

- Heq û hiqûqê kurdan (31/13)

AMED Xelîl

- Zarokname/1 (34-35/46)
- Zarokname/2 (36/23)

AMEDÎ Turabiyê

- Ez çi kes im (29/23)

ARAS Ahmet

- Lépirsîn (36/5)

ARSLAN M. İhsan

- Lépirsîn (34-35/11)

AZAD Medenî

- Axînek ji bo... (34-35/45)

AZADÎ Rojhat

- Lépirsîn (34-35/19)

BABÊ Hacer Bêrîvan

- Elî rabe (ji Seyid Eliyê Findikî) (31/27)
- Dîwan/1 (ji Seyid Eliyê Findikî) (32/5)
- Dîwan/2 (ji Seyid Eliyê Findikî) (33/12)
- Dîwan/3 (ji Seyid Eliyê Findikî) (34-35/34)
- Dîwan/4 (ji Seyid Eliyê Findikî) (36/26)

BAVÊ Xecê

- Pêşhatî ya îslamê ye (ji Seyyid Qutub) (27/24)
- Çar istilahêن Qur'anî yên bingehîn (ji Seyyid Ebû Ala el-Mewdûdi) (30/18)

BAVÊ Zîn

- Rastnivîsîna kurdî/1 (30/13)
- Rastnivîsîna kurdî/2 (32/4)
- Rastnivîsîna kurdî/3 (33/8)
- Rastnivîsîna kurdî/4 (34-35/38)

BAWER Ehmed

- Nazire (ji Mele Evdilqadir) (27/22)

BERÎVANI Azad

- Bikaranîna zimanê kurdî (27/14)

BERZ Koyo

- Pola bikin (30/11)
- Jahra awday (31/4)
- Qisey verênan (32/20)

BÊÇARE Raîfê

- Lava dikim (29/21)

BIRÎNDAR Husên

- Çiroka min û bapîrê min (27/21)

CAN Mehmed

- Hîlên şeytên (ji Muhyidînê Erebî) (26/26)

CANKURD

- Silavek bo dost û yaran (26/10)
- Newroz (28/17)
- Guhertina elfabeya kurdî (30/6)
- Çiyayo! (30/25)
- Welat nadim (33/31)
- Ez dê herim (34-35/24)
- Bo sêsalîya Nûbihar (36/18)

CEWERÎ Firat

- Lêpirsîn (36/9)

CIZÎRÎ Adnanê

- Du maf: Netew û ziman (32/25)

CÎHADVAN Selman

- İda min (28/23)
- Pirsname/1 (31/32)
- Pirsname/2 (32/32)
- Pirsname/3 (33/32)
- Pirsname/4 (34-35/48)
- Pirsname/5 (36/27)

ÇAMLIBEL Yılmaz

- Lêpirsîn (34-35/12)
- Lêpirsîn (36/7)

ÇEVİK Süleyman

- Hevpeyvîn bi gerînendeyê rojnama Welatê Me Mazhar Günbat re (26/20)
- Şeş pirs (ji Bedîuzzeman Seîdê Norsî) (27/7)
- Bi İsmail Göldâş re hevpeyvîn/1 (28/10)
- Bi İsmail Göldâş re hevpeyvîn/2 (29/24)
- Li ser edaletê (33/14)
- Lêpirsîn (34-35/13)

ÇEXOV Anton

- Kemana Roçild (25/24)

ÇİÇEK M. Rauf

- Lêpirsîn (36/5)

DEHSIWAR Mihemed

- Lêpirsîn (36/13)

DILGEŞ Felat

- Rexne û xwerexnekirin (30/22)
- Lêpirsîn (34-35/7)
- Lêpirsîn (36/15)

DILKANI Seyda

- Melayê qûrişa (34-35/42)
- Çengek tişt (34-35/43)

DILZAR Hozanê

- Tenê dayîk lorandin (29/9)

DOSKİ Tehsin İbrahim

- Mem û Zîn li çi dem jiya bûn (31/29)
- Du helbesten Feqiyê Teyran (32/22)

DURMAN Nurettin

- Bieci'bîn bieci'bîn û bistîn (29/15)
- Bi meqamê Huseynî (34-35/30)
- Şêx û mirin (36/22)

EFLATON

- (Şikeftî) (31/11)

EPÖZDEMİR Bedirxan

- Du helbest (34-35/37)
- Lêpirsîn (36/10)

EREBÎ Muhyidînê

- Hîlên şeytên (26/26)

ESLAN Şukrî

- Gazi li tirkan: Werin ser heqiyê (31/5)

ETMANÎ Behram

- Dua û niyeta rojiya remezanê (28/32)

EVDILQADIR Mele

- Nazire (27/22)

FARQÎNÎ Zana

- Lêpirsîn (34-35/14)
- Lêpirsîn (36/14)

FEQIYÊ Teyran

- Av (34-35/40)

FEQÎ Huseyn

- Lêpirsîn (34-35/15)
- Lêpirsîn (36/11)

FINDIKÎ Seyid Eliyê

- Elî rabe (28/29)
- Elî rabe (31/27)
- Dîwan/1 (32/5)
- Dîwan/2 (33/12)

- Dîwan/3 (34-35/34)
- Dîwan/4 (36/26)

FIRAT Zafer

- Tefsîra ayetan/1 (ji **Elî Şerîeti**) (32/11)
- Tefsîra ayetan/2 (ji **Elî Şerîeti**) (33/10)

GARÎB Şêx Omer

- Hevpeyvîn/1 (25/17)
- Hevpeyvîn/2 (26/12)
- Marksîzma dawîhatî û pirsgirêka kurdî (32/28)

GENÇ Nurullah

- Xiyal (27/29)

GÖLDAŞ İsmail

- Hevpeyvîn/1 (28/10)
- Hevpeyvîn/2 (29/24)

GURDILANÎ Azad

- Serokatiya Karêن Diyanetê û zimanê tirkî (34-35/35)

GÜLMEZ Naci

- Hevpeyvînek li gel Şêx Omer Garîb/1 (25/17)
- Hevpeyvînek li gel Şêx Omer Garîb/2 (26/12)
- Lépirsîn (36/16)

GÜNBAT Mazhar

- Hevpeyvîn (26/20)

HAYDAROĞLU Mele Alaeddin

- Bediuzzeman Seîdê Norsî (27/12)

KAHRAMAN Emîrsah

- Ji xebatkarêن Nûbihara xweşik re (27/25)

KARA Sabah

- Mesnewî/5 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (25/12)
- Mersiyeyên rojhilat/7 (25/16)
- Dubeytî/46-55 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (25/23)
- Rubaiyat/26-30 (ji **Omer Xeyyam**) (25/29)
- Mesnewî/6 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (26/4)
- Mersiyeyên rojhilat/8-9 (26/11)
- Dubeytî/56-65 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (26/16)
- Rubaiyat/31-35 (ji **Omer Xeyyam**) (26/19)
- Mesnewî/7 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (27/4)

- Mersiyeyên rojhilat/10 (27/9)
- Dubeytî/66-75 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (27/16)
- Rubaiyat/36-40 (ji **Omer Xeyyam**) (27/20)
- Mesnewî/8 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (28/6)
- Mersiyeyên rojhilat/11-12 (28/18)
- Dubeytî/76-85 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (28/21)
- Rubaiyat/41-50 (ji **Omer Xeyyam**) (28/25)
- Mesnewî/9 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (29/4)
- Mersiyeyên rojhilat/13-14 (29/10)
- Dubeytî/86-95 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (29/13)
- Mesnewî/10 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (30/4)
- Mersiyeyên rojhilat/15-16 (30/7)
- Dubeytî/96-105 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (30/14)
- Mersiyeyên rojhilat/17-21 (31/9)
- Mesnewî/11 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (31/15)
- Dubeytî/106-115 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (31/22)
- Mersiyeyên rojhilat/22-24 (32/12)
- Mesnewî/12 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (32/18)
- Dubeytî/116-125 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (32/21)
- Mersiyeyên rojhilat/25-28 (33/5)
- Dubeytî/126-135 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (33/9)
- Mesnewî/13 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (33/17)
- Dubeytî/136-145 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (34-35/31)
- Piştî sê salan Nûbihar (36/3)
- Dubeytî/146-155 (ji **Baba Tahirê Uryan**) (36/20)
- Mesnewî/14 (ji **Mewlana Celaleddînê Romî**) (36/21)

KARADEMİR Yakup

- Lépirsîn (36/8)

KARADENİZ Ali

- Kemana Roçild (ji **Anton Çexov**) (25/24)
- Yezîdî û yezîdîti (26/17)
- Mirov rêuî ye (29/14)
- Çend mulaheze li ser bêjeya "xwezayî"yê (31/20)
- "Bexçeyê vîşne" (34-35/32)

KERKÜKÎ Kameran

- Tahir Begî Caf (34-35/39)

KESKİN Abdullah

- Lépirsîn (34-35/4)

KILIÇ Suud

- Atakurd (ji Ahmet Altan) (31/26)
- Lépirsîn (36/14)

KOYTAK Cahit

- General çîma nikarin derkevin zikakan (31/12)

KURDISTANÎ Birîndar

- Sed nav û sed rengî bes el! (31/19)
- Nameyek bo Ehmedê Xanî (31/28)

KURŞUN Süleyman

- Lépirsîn (34-35/17)

KUTLAY Naci

- Lépirsîn (36/13)

MELA Qasim

- Nuqurç/49-53 (34-35/23)
- Nuqurç/54-58 (36/19)

MERYEMXAN

- Xiyal (ji Nurullah Genç) (27/29)

MEWDÛDÎ Seyyid Ebûl Ala el-

- Çar istilahêن Qur'anî yên bingehîn: Îlah, reb, dîn, îbadet (30/18)

MIHACIR Aqîl

- Hovîtiya hovan û em (27/10)
- Zanîna zîmîn û ronîkirina gel (27/27)
- Hêvîdarî û geşkirina roleyên me (28/30)
- Serkevtina dil (32/15)

MIRADXWAZ

- Nalînêñ birîneke kevnenû (31/17)

NAS Ehmed Xemgîr

- Şî'ra Şêxê Ezîz (31/31)

NORSÎ Bedîuzzeman Seîdê

- Şeş pirs (27/7)
- Azadî û idareya adil (32/6)

NÜBIHAR

- Di destpêka sala sêyemîn de (25/3)
- Ji neqenciyê sûistîfade nabe, lê ji qenciyê sûistîfade dibe (26/3)
- Xwexapandin: "Tu ji me yî, baş î; ne ji me yî,

ne baş î" (27/3)

- Pêwîstiya tekûzkirina alfabeşa kurdî (28/3)
- Xweşber, Mîrate, Rono û sirûdêñ bêrikirinê (28/20)
- Çi gotin! (28/24)
- Nûçeyên mehê (28/32)
- Îflasa siyaseta dînê resmî, miletê resmî, mezhebê resmî (29/3)
- Weşanêñ kurdî yên nû (29/31)
- Îhmaleke tarîxî: Di îslamê de heq û hiqûqê miletan (30/3)
- Dijminêñ zatê mirov (31/3)
- Serokê Karêñ Diyanetê nizane ku çi dibêje (32/3)
- Zora qanûnan, zora siyan (33/3)
- Rapora "Pirsgirêka Rojhîlat" a TOBB: Şîr û sîr tevlihev (34-35/3)

NÜRULLAH Newzad

- Bedîuzzeman Seîdê Norsî (ji Mele Alaeddîn Haydaroglu) (27/12)
- Em kî ne, ji kû têñ, diçin kû (29/22)
- Em û seydayê me Ustad Bedîuzzeman Seîdê Norsî (Kurdî) (30/29)
- Xebatkarêñ Nûbihara delal re (31/25)

OFLAZ Hozan

- "Gotinêñ navdaran" (30/26)
- General çîma nikarin derkevin zikakan (ji Cahit Koytak) (31/12)
- Wek ku qe nîn e (ji Hilmi Yavuz) (32/10)
- Strana kesê ku li xaniyê bilind rûdine (ji Gültén Akın) (33/21)
- Gotina dawî (ji Gültén Akın) (33/21)
- Bi meqamê Huseynî (ji Nurettin Durman) (34-35/30)
- Şêx û mirin (ji Nurettin Durman) (36/22)

OMERÎ ï.

- Sersal (29/18)
- Keça perî (30/31)

ÖNAL Ahmet

- Lépirsîn (36/15)

ÖZDEMİR Latif

- Gazin ji cîhanê (32/17)
- Xewnek xweş (33/28)
- Lépirsîn (36/10)

PAŞA Berhîm

- Gaziya min (30/10)

POLAT Lokman

- "Hêz û bedewiya pêñûsê" (28/27)

- Kovarek nû: Çira (30/32)
- Lépirsîn (36/12)

QUTUB Seyyid

- Pêşhatî ya îslamê ye (27/24)

ROMÎ Mewlana Celaleddînê

- Mesnewî/5 (25/12)
- Mesnewî/6 (26/4)
- Mesnewî/7 (27/4)
- Mesnewî/8 (28/6)
- Mesnewî/9 (29/4)
- Mesnewî/10 (30/4)
- Mesnewî/11 (31/15)
- Mesnewî/12 (32/18)
- Mesnewî/13 (33/17)
- Mesnewî/14 (36/21)

RÜŞEN Xurşid

- Sûreta Nas û dergahê penahiyê (29/16)
- Qelaştina tarîtiyê: Sûreta Feleq (30/15)
- Peyama Qur'anê: Sûreta Îxlas (31/23)
- Bedencama kufrê: Sûreta Leheb (33/19)

SAĞLAM Bahaeeddin

- Serab (29/19)

SALİHOĞLU M. Latif

- Lépirsîn (36/17)

SMAİL Selîm

- Li vir ne bes bû, dora wir e! (30/21)
- (Şikeftî) (ji Eflaton) (31/11)

ŞAHREZA Bîrewer

- Marksîzma dawîhatî û pirsgirêka kurdî (ji Şêx Omer Garîb) (32/28)

ŞERİETÎ Eli

- Tefsîra ayetan/1 (32/11)
- Tefsîra ayetan/2 (33/10)

ŞOREŞ Suleyman

- Sefînetun kesefînetî Nûh (27/32)

TEKOŞİN

- Mar û rovî (27/26)

TİMURTAŞ Abdulhadî

- Minafiq Û Mescida Dirar (27/30)
- Seyda Mele Xelîlê Hêzanî û "Nehcul Enam" a kurdî (29/20)

TUNÇ Osman

- Hewl el-qeziyyet el-kurdiyye (25/32)

- Lépirsîn (34-35/21)

URYAN Baba Tahirê

- Dubeytî/46-55 (25/23)
- Dubeytî/56-65 (26/16)
- Dubeytî/66-75 (27/16)
- Dubeytî/76-85 (28/21)
- Dubeytî/86-95 (29/13)
- Dubeytî/96-105 (30/14)
- Dubeytî/106-115 (31/22)
- Dubeytî/116-125 (32/21)
- Dubeytî/126-135 (33/9)
- Dubeytî/136-145 (34-35/31)
- Dubeytî/146-155 (36/20)

UZUN Mehmed

- Li ser "Pêwîstiya tekûzkirina alfabeşa kur-dî" (29/8)

XERÎB Abdullah

- Lépirsîn (36/17)

XEYYAM Omer

- Rubaiyat/26-30 (25/29)
- Rubaiyat/31-35 (26/19)
- Rubaiyat/36-40 (27/20)
- Rubaiyat/41-50 (28/25)

YAVUZ Hilmi

- Wek ku qe nîn e (32/10)

YEKTA Ayhan

- Netew û pêşveçûna zimên (27/18)

YILDIZ Bekirhan

- Em û xelkê din (30/20)

YÜKSEL Mufid

- Jiyannameya Şêx Es'edê Erbîlî (26/31)

ZELAL Rojîn

- Eqlê hin ji tirkan hin bi hin tête serê wan (30/9)

ZEND Dr. Yusif Dara

- Alfabeşa latînî ji bo zimanê kurdî (33/29)

ZINAR Zeynelabidîn

- Rewşenbîr û rewşenbîrî (25/14)
- Mast (28/19)
- Peymana Amasyayê (1514) (29/11)
- Gelşa alfabeşa kurdî (29/30)
- Lépirsîn (34-35/6)
- Tirkbapîr û Kemaltîtî (34-35/26)
- Lépirsîn (36/9)

KITÊBÊN EM BELAV DIKIN

(DAĞITIMINI YAPTIĞIMIZ KİTAPLAR)

Kitêbên kurdî (Kürtçe kitaplar)	(Hundir:TL) (Derve:DM)
• Rîsala Biratiyê (Uhuvvet Risalesi)	50.000 3
• Rîsala Biratiyê (Bi tîpên erebî)	50.000 3
• Peyiva Bîst û Sêyemîn (23. Söz)	50.000 3
• Peyivêن Piçûk (Küçük Sözler)	75.000 5
• Nimêj Dikim / Komisyon (Kuşe)	120.000 8
• Nimêj Dikim / Komisyon (Sipî)	100.000 6
• Dîwan / Mele Ehmedê Cizîrî	200.000 12
• Doza Jîn / Hiseyn Elî Başar	75.000 5
• Ferheng (kurdi-tirkî, tirkî-kurdi) / D. Izoli	450.000 25
• Ferheng (zazakî-tirkî) / Malmîsanij	250.000 12
• Mewlûd (latînî) / Mele Ehmedê Bateyî	100.000 6
• Mewlûd (erebî) / Mele Ehmedê Bateyî	60.000 4
• Mewlûd (erebî) / Mihemed Emînê Heyderî	60.000 4
• Nûbar / Ehmedê Xanî	80.000 5
• Mewlûd / (zazakî) Mele Ehmedê Xasî	75.000 5
• Eqîda Îmanê (erebî) / Mihemed Emînê Heyderî	25.000 2

Kitêbên tirkî (Türkçe kitaplar)

• Bediuzzaman'ın Hayatı / Abdurrahman Nursi	80.000 5
• Bediuzzaman'ın Volkan Yazıları / Osman Resulan	80.000 5
• Şırnak Baskını / Osman Resulan	90.000 5
• Aydınlık ve Dindarlık / Abdulkerim Suruç (Çev. Sabah Kara)	90.000 5
• Ayet Yorumları / Ali Şeriatı (Çev. Sabah Kara)	120.000 8
• Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması/A. Suruç (Çev. Sabah Kara)	90.000 5
• İllerici Gericilik / Abdulkerim Suruç (Çev. Abdullah Kutlu)	60.000 4
• Peygamberler Aydınların Önderleri / A. Suruç (Çev. Abdullah Kutlu)	90.000 5
• Zamanın Zeynebi / Zeyneb Burucerdi (Çev. Zafer Fırat)	80.000 5
• 36. Paralel ve Ortadoğu / M. Selim Akdoğan	100.000 6
• Hasretinden Sürgünler Bitirdim / Medeni Azad	80.000 5

Kitêbên erebî (Arapça kitaplar)

• Lemalar (el-Leme'at)	400.000 25
• Mektubat (el-Mektûbat)	400.000 25
• Sözler (el-Kelîmat)	500.000 30

Kitêbên li jor, bi hundir û derve, bi bîst ji sedî (20 %) erzanî têne şandin. Yênu ku hun dixwazin,bihaya wan hesab bikin, ji mecmûa bihayê, 20 % kêm bikin, baqiyê li hesabê jêrê razînin û fotokopiyeyeke pela razandinê, bi mektûba xwe ya ku we navê kitêban têde nivi-sandiye, bişînin navnîşana kovara me.

(Yukarıdaki kitaplar yurt içi ve yurt dışına % 20 indirimle gönderilir. İstediklerinizin tutarını hesaplayın, toplamdan % 20 düşün, geriye kalan tutarı aşağıdaki hesaba yatırın ve alındı belgesinin fotokopisini, istediğiniz kitapların isimlerini ihtiva eden mektupla birlikte dergimizin adresine gönderin.)

JIMAREYÊN HESABAN (HESAP NUMARALARI):

Li hundir (Yurt içi): Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

Li derve (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

NAVNIŞAN (ADRES):

Nûbihar, Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih / İstanbul
Tel: (212) 533 75 88 Faks: (212) 524 00 38

Nûbihar

www.arsivane.com